


Malbateke ji Kampa Etrûşê ku ji ber zilma PDK'ê hatiye Stenbolê:


## Ferqa zilma Roma reş û ya PDK'ê tune ye



*Li Stenbolê du ciwanên HADEP'ê revandin*

### Ji polîsan Taktîkên Kontrayî

✓ Pişî Kongreya Sêyemîn a HADEP'a Stenbolê du ciwan ji aliyê polîsên sîvîl ve nava rojê li ber çavên her kesî hatin revandin. Berê ji hinek kesên demokrat û şoreşger ji hêla heman hêzan ve hatin revandin û hinek ji wan hatin windakirin. Ev êrîş nîşan didin ku dewlet taktîkên xwe yê kontrayî bi Kurdistanê bi sînor nake. Li metropolan jî dest davêje heman taktîkan. Rayedarên HADEP'a Stenbolê bang li derdorên demokratîk kirin da ku li hemberî van êrîşan pejinkar û hişyar bin.



✓ Ji devê penaberan:

"Îşkenceyên ku leşkerên tirk û PDK'yîyan dikirin ji hev zêde ne cuda bûn. Em birin Dihokê avêtin hepsê, li wê derê 6 meh û 16 rojan em girtî man. Hevdîtîna ji bo me qedexa bû. Piştî agirbest çêbû, bi riya tirampeyê em berdan. Erzaq berê dihat, lê piştî ku PDK'ê ambargo danî ser me, Neteweyên Yekbûyî jî ji herêmê vekîşiya. Piştî wê rûdanê êdî meydan ji PDK'ê re mabû. Penaberan du mehan sax bi tenê berû û pelgên daran dixwarin. Kesî ji me nikaribû derketa derveyî kampê. Gelek caran em ji hêla PDK'ê ve dihatin gulebarankirin. Ji peydabûna nexweşiyên 8 zarokan jî yana xwe winda kirin. Di dema şerê PDK û PKK'ê de 18 penaber ji hêla PDK'yîyan ve bi rêbazên hovane hatin kuştin. Ev qewmîna li ber çavên Neteweyên Yekbûyî pêk hat lê wan tu tişt nekir.

Nîrxandin: *Li Amedê dengê 'Metro-FM' hate birîn* – Rûpel 4

Bîranîn: *Pênc Pilingên Geliyê Rizê* – Rûpel 6

Çîrok: *Tirsa 15'ê gelawêjê di dilê wan hilnedihat* – Rûpel 10

Nûçe: *Sînorên çêkirî di mêjiyê kurdan de rûxiyane* – Rûpel 16


Nejdet Buldan: *Nijde (1)* rpl.5

Hasan Kaya: *Giya di bin kevirand de namîne* rpl.13

Mirhem Yiğit: *Ber bi Kongreya Înstîtuya kurdî..* rpl.7

Bekir Şivanî: *Ke zimanî çek dête go* rpl.11

Azadiya WELAT



SAMI TAN

# Çete nikarin li ber aştîyê bibin asteng

**E**v hejmara rojnameyê Roja Aştîyê ya Cîhanê 1'ê rezberê digire nava xwe. Di rojêke wisa de mirov dixwaze li ser aştîyê hin tiştan bibêje da ku hêviya aştîyê berzîr bibe, lê mixabin her çiqas îsal hinek çalakiyên aştîyê hebin jî, ji çalakiyên sala çûyî kêmtir in. Lewre di rojêka şerxwaz û mirovkujan de aştî tune, kesên ku dixwazin li ser vê mijarê hin tiştan bikin jî dengê wan tê birîn. Di vî warî de mînakê herî berbiçav birêz Eşber Yağmurdereli bû, bi serkêşiya wî "Milyonek şanên ji bo aştîyê" hatin berhev kirin û ew şanên spartî serokê meclîsa tirk, lê tu deng ji meclîsê derneket. Berevajî wê yekê, dewleta tirk rik li wî girêda û dawîya dawî jî, ew birin avêtin girtîgehê. Çavnebariya dewletê li hemberî banga aştîyê ew qas zêde ye ku nehiştin roja 26'ê gelawêjê komek jin daxuyaniya çapemeniyê li Meydana Taksîmê bixwînin. Dîsa ev du hefte ne hêzên dewletê êrîşê dibin ser malbatên windahiyan û hemû beşdarên

binçav dikin. Pêpeskirinên mafên mirovan digel gurbûna şer zêde dibin. Hêzên dewletê taktîkên kontrayî li hemberî kes û sazîyên azadîxwaz bi kar tînin. Gund hê jî tene valakirin, mirov hê jî tene revandin û windakirin, îşkence her berdewam e. Deriyê sazîyên demokratîk tê niftekirin, rayedarên partîyan tene girtin. Hestên şovênîst sîstem xitimandiye, lewre jî kesên aştîxwaz û mafparêz dibin nişangeha tîrên çeteyan.

Heta vê derê tiştên ku hatin gotin aliyê kambaxê rewşê vedibêjin. Lê wekî her tiştî rewşa em tê de jî ne yek alî ye. Li hemberî zîlm û zora dagirkeran berxwedaneke xurt heye. Şerê azadiyê ji sînorê Kurdistanê derbas bûye, li qeraxa Behra Reş û Behra Spî hêzên yekbûyî gavên berbiçav davêjin. Li hundir û derve tevgera azadiyê konseptê MGK'ê ku marjînkirina tevgerê dabû ber xwe, bi avê de bir. Êdî bi gotina kevnêdiplomate tirk Şükrü Elekdağ lingên leşkerên tirk li Kurdistanê êrd nagire, li ser pehniyan rawestiyane.

Di qada navneteweyî de dewleta tirk bi bertilan jî êdî nikare kesî bike hevparê sûcên xwe. Dosyayên pêpeskirina mafên mirovan li ber Komîsyona Mafên Mirovan a Ewropayê kom bûne. Ji ber ku tu parêzer nikarin dewleta tirk biparêzin, dev ji parêzeriyê berdidin. Di qada navneteweyî de Peymana Lozanê ku di çavê rayedarên dewletê de bûye wekî tabûyekê dibe mijara nîqaşan. Çeteyên ku dewletê bi destê xwe afiradine niha li ser dewletê bûne bela. Her roj yek ji wan tê girtin û tîkiliyên wî bi rayedarên dewletê re eşkere dibin.

Her wiha digel hemû êrîşên dewletê sazîyên neteweyî her roj ji roja din xurtir dibin. Bo nimûne di nava demê kurt de Azadiya Welat gavên berbiçav ber bi pêş avêtin. Piştî nûnergehên Mersîn û Îzmîrê di 29'ê gelawêjê de jî nûnergeha Amedê vedibe.

Ev rewş dide nişan ku temenê şerxwaz û dagirkeran ne dirêj e û dê li ber lehiya azadiyê bibe qirş û qal.

Êdî bi gotina kevnêdiplomate tirk Şükrü Elekdağ lingên leşkerên tirk li Kurdistanê êrd nagire, li ser pehniyan rawestiyane. Di qada navneteweyî de dewleta tirk bi bertilan jî êdî nikare kesî bike hevparê sûcên xwe.

# Erîşên bêhempa bingeha serkeftinên bêhempa ne

MEHDÎ TANRIKULU

## Ferhengok

- amûr: hacet
- arizî: taybetî
- bertek: reaksiyon
- birûsîn: biriçîn
- ciniqandin: tirsandin
- çavsofî: hovîtî
- çermor: amerîkiyên xweçihî
- dahûrandin: analiz
- derbest: ciddî
- dorpêç: gemaro
- dojeh: cehennem
- dijberî: hemberî
- dirûşme: slogan
- erdhej: zelzele
- erdnîgarî: coxrafya
- erjeng: tirsnak
- êzgeh: istasyon
- handêr: teşwîqkar
- hevalcêwî: ikiz
- karrdeş
- jendin: ristin, şekirin
- kelepor: mîrate
- kevnar: antîka
- nixurî: zaroka/ê
- pêşî
- payeberz: payebilind
- penabar: mülteci
- peyam: mesaj
- peyitandin: tasdiqkirin
- pitik: Zaroka
- berşîr
- qerf: Henek
- pêkanîn
- rewnaq: görkem
- rêpêşander: rehber
- sosret: ecêb, rezîl
- surişt: xweza
- stargeh: sixinax
- şanênaw: îmze
- vejbûn: vejin
- xizan: feqîr, hejar
- xurîfn: gêjbûn
- xwefî: ax, arî
- zanko: zanîngeh
- zêmar: staranê
- şînê, lorandin

**H**eke êrîşên paşverû, bi berxwedaneke pêşverû neyê bersivandin û li ser vî bingehê ku serkeftin neyê afirandin li wir viyan di tengasiyek giran de ye û hin bi hin dihele; ta kesantiyê li qadê nehêle.

Her ku mirovahî bi kedê re hevnas bû û afirî, li ber rîyeke dirêj û xumam u erjeng dirêj dibû. Bîlêvîkirina dema borî, seranserî wê rastiya erjeng e.

Diroka civakbûnê, bi taybetî jî diroka civaka çindar di heman gavê de jî diroka zordarî û erjengiyê ye. Di beyana dirokê de esil wateya van bûyerên pêkhatî, di naveroka wan de veşarî bû. Daxwazêke bi tenê bûbû armanc; desthilatdariya çînî bû ku he-ta niha jî li ser vî kakilî şerê hebûn û tunebûnê tê meşandin.

Erê, şerê nakokîya, pêşveçûnê diafirîne. Navrok û rengê rawestîna li hemberî nakokîyan jî wesîfê pêşveçûnê û jiyana ku di encamê de bê afirandin, nişan dide. Kûrahiya naveroka nakokîyan, dibe sedema kûrahi û ferehiye afirandin jiyana nû. Ev jî watedariya hemû delalî û narîniyan di hundirê xwe de dihevine. Lewre wekî ku bê şerê dijberan tu jiyana nayê afirandin, tu delalî û tîgîştîniyên nû jî nayên afirandin. Heke li hemû bûyerên ku dirok ber bi pêş ajotîne bê nihêrtin, ev rastî bi zelalî dê bê dîtin. Jindarî li hemberî astengiyên xwezayî bi şerêkî li gorî wê dikeve qada jiyane. Ev zagonên xwezayî jî bo bûyerên civakî jî derbas dibin. Afirandina her jiyaneke nû, afirandina civakeke nû jî di encama şerêkî li gorî wê pêk hatiye. Li ser wê bingehê dara mirovahiyê şax vedaye, gul vedaye. Lê nakokiyên bingehîn jî ber ku jî binî ve û bi hemû dorfirehiya nehatibû çaraserkirin, dijberiya nava mirovan berde-

wam kir. Ji ber ku ev bûyerî ser bingeha kûrbûna nakokiyên dijber pêk hatine, nakokîya jindar jî li ser van mercan jî nû ve jinê diafirîne. Wateya vê, li hemberî wê zordariya dirokî berxwedana şoreşgerî, ya dirokî ye. Li hemberî van rikeberiyên dirokî serkeftina şoreşên civakî, di nerîta hêzên şoreşger de jiyana jî nû ve afirandiye. Ev qonaxên erjeng, bi mînakên dagirtî ne. Ji bo ku di kesantiya kedkaran de, jiyane dîlgirtî bihêlin û roj bi roj hemû tiştên li derveyî mirovahiyê rik bikin; desthilatdarên mijokdar bi êrîşên bêhem-

pa tim û tim bala kişandîye ser xwe. Ev jî bûye sedema ku dagirker jî bo wê dagir bikin, di her warê jiyane de li ser gelê êrîşên tevkujiyê yên ku nehatine dîtin û bihistin pêk bînin. Palo, Gênc, Hênê, Dêrsim, Qocgirî, û Agirî, Helepçe, hwd. çend mînakên ku biranînên wan hê jî mirov diricifînin in. Bi carên bê hejmar ev mînakên ku hatin dubare kirin, bi pêkanîna dagirkeriya bêhempa li ser mejiyê gel hate afirandin. Her ku komara tirk afirî û pêde bû hemû giraniyan xwe da ser neritandina politikayên piştaftinê. Bi tevkujiya spî ya erjeng gelê Kurdistan jî qada dirokê dihate rakirin. Êdî gel, jî rastiya xwe dihate durrîstin.

**Bêguman zordariyên bêhempa, şênberbûna serkeftinên bêhempa zûtirîn dikin. Ji bo wê yekê, mînakê zîndana Amedê balkêş e. Li hemberî rîka zordariya bêhempa, serkeftina jiyane jî bêhempa bû.**

Ev erjengî bû beşeke jiyana gel a rojane û her roj bi carên bêhejmar dubare dikir. Di bin vî zordariyê de jiyana gel bêbersiva gel jî bêhempa afirî.

Bêguman zordariyên bêhempa, şênberbûna serkeftinên bêhempa zûtirîn dikin. Ji bû ve yekê, mînakê zîndana Amedê balkêş e. Di mercên zordariya bêhempa

pa van pêkanînan xwe bi cih tînin. Bi taybetî jî pêvajoya emperyalî, jî bo êrîşên bêhempa derfetên bêhempa afirandine. Li ser armancê berdewamkirina desthilatdariya xwe ya mijokdar astengiyên ku aqilê mirov nagire, çêkirine. Helbet, jî bêhempatiyê re qada Kurdistan sereke ye, yekem e. Diroka êrîşkariya ku li Kurdistanê jî alî mêtîngeran ve hatiyê pêkanîna diyar e ku diroka êrîşkariyêkî bêhempa ye. Ev çawa şênber dibe? Ji bo wê yekê divê mirov li diroka Kurdistanê binihêre, wê gavê li ber mirov bi carekê dirêj dibe, mînakên cur bi cur ên tevkujiyê. Lewre Kurdistan, xwedîye rastiya dergûşa mirovbûnê ye. Bi dewlemendî û delaliya we ya bêhem-

de jiyana di azmûna hebûn û tunebûnê de mabû. Vîna tazî ya kaniyan jinê li hemberî zordariya dirokê, li ber xwe dida. Li hemberî vî rîka zordariya bêhempa, serkeftina jiyane jî bêhempa bû. Lewre ev serkeftina jiyana mirovahiyê bû. Bi afirandina çanda şoreşê vîna serketinê şax veda û fêkiyên rûmeta mirovahiyê bi navê Mazlûm, Ferhat, Necmî, Eşref, Mahmûd, Kemal, Xeyrî, Akîf, Alî, Zekiye, Raşan, Bêrivan, Ronahî... û li ser vî bingehê bilindbûna bûyerên herî mezin; Zîlan, Rewşen, Bermal; bûn asta vîna azadbûna kesantiyê ya li Kurdistanê. Bêguman ev şênberbûna şoreşan kesantiya Kurdistanê ye, angû serkeftinê.

# Polîsên Stenbolê dest avêtin Taktîkên kontrayî

11'ê meha gelawêjê serê sibê saet li dora 10.00'an ez ji navçeyê derketim. Ez ji sûka navçeyê ber bi Parka Çetin Emeç çûm. Min ji nişka ve du kesan xwe avête ser min û ez bi dafdanê xistim erebeyê. Min kire qîre qîr, li ber xwe da, min got hûn kî ne. Gotin em polîs in. Çavên min girêdan û destê min kelepçe kirin.

Li Stenbolê di meha gelawêjê de du endamên HADEP'ê ji aliyê polisên sivil ve bi taktîkên kontrayî hatin revandin. Hefteyekê bi rêbazên cur bi cur li wan îşkence hate kirin. Li gorî rapora bijîşkan hestiyê piştî maxdurê bi navê Abdulselim İnan hatiye şikênandin. Li ser zêdebûna bûyerên bi vî rengî roja 25'ê gelawêjê li navenda HADEP'a Stenbolê daxuyaniyeke çapemeniyê hate dayîn. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku ev êriş bi awayekî giştî li ser HADEP'ê û gelê kurd têne meşandin.

## Kontgerîla û Tirkiye

Wekî tê zanîn dewletê bi salan li Kurdistanê taktîkên kontrayî li ser kesên aşîxwaz, şoreşger, demokrat û rojnameger bi kar anîn. Di salên 1990-94'an de dewleta tirk ji bo çewisandina raperînên gel û jiholêrakirina kesên ronakbîr ên ku pêşengiya raperînan dikirin ew taktîkên kontrayî bi kar dianîn. Di van demên dawîn de li metropolên Tirkiyê bûyerên bi vî rengî zêde bûn. Bi giştî jî ev hêza nehênî li ser endamên HADEP'ê yê ciwan gelekî radiweste. Piştî kongreya sêyemîn a HADEP'a bajarê Stenbolê du ciwan, yek ji wan Sserokê Komîsyona Ciwanan a HADEP'a Ümraniyeyê Abdulselim İnan, yek jî Endamê Komîsyona Ciwanan HADEP'a Kadikoyê Mansur Çelik li ser hev ji aliyê polisên sivil ve nava rojê li ber çavên herkesî hatin revandin. Her du ciwan di nava mehekê de tên revandin. Ji aliyê polisên ve pêşîn Mansur Çelik ji kolaneke nêzikî navçeyê tê revandin û 3 rojan bi awayekî ne fermî di binçav de dimîne. Dûre jî Abdul Selam İnan. Ew jî ji ser kolana nêzikî Parka Çetin Emeç, ku ew kolana jî li Ümraniyeyê kolana herî qelebalixê tê revandin û hefteyekê bi awayekî ne fermî di binçav de dimîne. Di operasyona revandinê de van hêzên Kontrayî taktîkên zor seyr bi kar anîne. Dema van polisên kontra, Abdul Selam İnan revandine tişortê wî kişandine serê wî. Ji bo ku esnafên derûdora wan reaksiyonê nîşan nedin nasnameyên xwe derxistine û gotine em polîs in. Bi nasnameya xwe ya polîsbûnê esnaf bêdeng xistine. Balkêş e her du ciwanên ku tên revandin bi awayekî ne fermî jî tên serbest berdan. Abdulselim İnan li ser riyaya Edirneyê êvarê ji erebeyê tê daxistin û



Bin wêne: Li jorê her du ciwanên ku ji aliyên polisên ve hatibûne revandin, li HADEP'a stenbolê tiştên ku di serê wan re derbas bûne bi daxuyaniyeke çapemeniyê vedibêjin.

polisên kontra bi awayekî lezgînî ji cem dûr dikevin. Skandaleke mezin e ku li gel hemû serlêdanên HADEP'ê jî, binçavkirina her du ciwanan, ji aliyê emniyetê ve nayê pejirandin.

## Hûn çima diçin HADEP'ê

Maxdurê pêşîn Mansur Çelik ku ji aliyê kontra-polisên ve hatiye revandin 3 rojan li Vatanê maye. Wî bûyera ku di serê wî re derbas bûye ji me re wiha vegot: "Serê sibê dema ez çûme partiyê sê erebe li raserî partiyê sekinîbûn. Sê kes nêzikî min bûn û yekî ji wan destê xwe avête destê min û ez birim erebeyê. Pêşî çavên min di erebeyê de girêdan. Erebeyê bi markeya Toros bû. Ez birim Midûriyeta Emniyetê ya li ser kolana Vatanê. Ez xistime odayekê. Ez tê gihîştim ku 10-15 kesên din jî li wê derê hene. Çi kesê ku di ber min re derbas dibû li min dixist. Digot: "Çima tu diçin HADEP'ê. Hûn zanin ku HADEP têkoşîna gelê kurd diparêze. Eger hûn carekî din herin em ê we bikujin. Lê tevî wan yekan gelekî hakaret li me û rêveberên me dikirin. Çêrên pîs dikirin. Demançe dane serê min û ez tehdît kirim. Gelek pîrs der barê kongreya HADEP'a Stenbolê de ji min kirin. Digotin em ê we bibin bal malbata we. Gelo malbate we li ser vê yekê çawa difikire. Qet xwarin nedan min."

Abdulselim İnan jî piştî Çelik tê revandin. Ew jî hefteyekê di binçav de dimîne. Li ser girtina wî jî zabit nayê girtin. Bi awayekî ne fermî jî tê berdan. Ew jî bûyera xwa wiha vedibêje: "Roja 11'ê meha gelawêjê serê sibê saet li dora 10.00'an ez ji avahiya HADEP'ê ya navçeyê derketim. Ez ji navenda navçeyê ber bi Parka Çetin Emeç diçûm. Min nedît ji nişka ve du kesan xwe avête ser min û ez bi dafdanê xistim erebeyê. Min kire qîre qîr. Li ber xwe da, min got hûn kî ne? Gotin em polîs in. Çavên min girêdan û destê min kelepçe kirin. Îşkenceyê de derbas bûn. Her çar rojên min jî bi îşkenceya avê, ceryanê, asqiyê û bi lêdana wekî din bû. Digel van yekan ez tehdît dikirim, demançe didane serê min û digotin: "Bibe ajan eger tu bi me re bixebitî em ê gelek pereyan bidin te. Em ê malbata te jî bînin vê derê." Niha hestiyekî piştî min şikestiyê tedawiyê

dibînim. Her du rojên dawîn qaşo ez bi heban û melhemekê tedawî kirim. Roja dawî dora şeşan ez li erebeyê siwar kirim û nêzikî du saetan em çûn. Ez dizanim ku ji Stenbolê derketine, texmîn dikim ku em li ser riyaya Edirneyê bûn û êvar bû. Li ser rê çavên min vekirin, kelepçe ji destê min deranîn û bi lez ji cem min dûr ketin."

Li ser van yekan em bi Cigirê Seroke HADEP'a Stenbolê Veli Haydar Güleç re axivîn. Wî diyar kir ku jiyana endamên HADEP'ê bi wan gelekî girîng e. Ew ketine gumanê ku her du ciwan bîndakirin. Wekî minak Güleç bi bîr dixê ku, li Kurdistanê jî bûyerên bi vî rengî qewimîne. Taktîkeke bi vî rengî bi wan qet xerîb nehatiye. Her wiha Güleç li ser parastina mafê mirovan jî daxuyand ku, mirov bi vî awayî nayên parastin. Bi awayekî çetewarî li ber çavên her kesî mirovan direvîn û bi awayekî ne fermî jî berdidin. Em di vî warî de zelalîn. Ew dixwazin hin mesajên bişîmin. Lê me jî mesajê xwe daye. Heta ku kiryarên van revandinan dernekin, em ji pey vê bûyerê venagerin. Güleç da zanîn ku ew dê dozê li dijî xwediyên vê kirinê vekin.

AZAD ALTUN

Li Amedê radyoyek demokrat hebû, ew jî rastî xezeba RTÜK'ê hat

# Dengê Metro FM hate birîn

Metro FM, dûrî van xêzan weşana xwe didomand. Vê radyoyê bi awirekî demokratîk û bi şeweyekî nêzî welatparêziyê bernameyên nîqaşan û pêşbazî amade dikirin. Di nav weşana xwe ya muzîkî de bi giranî cih dida muzîka kurdî ya şoreşger. Zor didan sînorên sansûrê yên RTÜK'ê. Lê belê, ev radyo tu car jî xezeba dewletê nefilîfî, niha jî bo salekê cezayê rawestandina weşanê lê hatiye birîn.

**R**adyo, di nav amûrên ragihandinê de ya herî kevnare ye. Digel ku hew qas berhemên dîtbarî yên ragihandinê hatîbin afirandin jî, careke din radyoyê, ji despêkê ta niha jî girîngiya xwe tiştêk wînda nekiriye. Îro li cîhanê bi deh hezaran êzgehên radyoyê xwe digihînin guhdarên xwe. Li Tirkiyê jî, ta beriya salên nodî, radyo, bes di destê dewletê de bûn. Dewletê, bi riya van radyoyan îdeolojiya fermî ya kemalist dixist nava dilê gundî û kedkarên Anatoliyê û gelê kurd. Kemalîzmê, bi riya van kanalên radyoyan dil û mejiyê gelê kurd, karker û kedkarên Anatoliyê dagir kir. Piştî salên nodî li Tirkiyeyê, bi geşbûn û pîrbûna îmkanên teknolojîk re kanalên televîzyon û radyoyên arizî ketin nava jiyana weşanê. Pêşî, dewlet ji vê pêşveçûnê ciniqî. Dest bi qedexekirina weşanên arizî kir. Gel û gelek derdorên qerfên xwe bi vî kirinê kirin. (Kampanyaya protestoyî wekî "Ez radyoya xwe dixwazim" û girêdana bandên reş pêk hatin). Dewletê, rabû destûr da weşana van navgînan ragihandinê. Lê, bi avakirina RTÜK'ê (Lijneya Bilind ya Radyo û Televîzyonan) ev navgînan arizî yên weşanê bi tevayî ketin bin kontrola dewletê û xêza wan bi tevayî ji layê zîhnîyeta mêtînger ve hate dorpêçkirin.

Îro li her bajarî heta li gelek navçeyan bi dehan kanalên TV. û radyoyên arizî hene û yekser weşana xwe didomînin. Ev kanal, digel ku rasterast bi siste-

mê re ne girêdayî ne jî, di encamê de ji sistema mêtînger zêdetir berjewendiyên wê diparêzin.

## Radyo jî alîkariya şerê taybet dikin

Li Amedê jî, ta niha 15 radyoyên arizî dest bi jiyana xwe kirine. Gelek jî kanalên televîzyonê hene, lê niha em zêdetir di vî mijara xwe de dixwazin li ser radyoyan û bandora wan a neyînî bisekinin. Ji van 15 radyoyan, 6 heban jê ji ber tengasiya aborî weşana xwe rawestandine. Neh radyoyên ku niha weşana xwe yekser didomînin; Can Radyo, Aktuel Radyo, Radyo Değişim, Radyo Diyar, Radyo D. û ANKA FM di xêzeke arabesk, pop, lûmpen û xurîfî de weşanê dikin. Nur FM, Genç FM û Çağrı FM di xêzeke îslamî (!) de weşanê dikin. Bi tenê Metro FM li ser xetê demokrat weşanê dike. Lê belê, ev radyo jî, ji despêka weşana xwe ta îro, her tim dibe hedefa fêrîşên dewletê û saziya wê RTÜK'ê. Ta niha bi dehan car weşana wê hatiye rawestandî. Niha jî, bi biryara RTÜK'ê bi hinceta ku METRO FM'ê di Newroza 1998'an de di bernameyên xwe de propandaya cudaxwaziyê kiriye, ji 7 tîrmeha 1998'an pê ve salekê cezaya rawestandina weşanê lê hatiye birîn.

Niha, li Amedê meydan ji radyoyên yoz û yên qaşo îslam re maye. Ev radyoyên arizî bi weşanvan xwe yê qirêj, eletwş û şatopato dil, mejî û kesayetiya gelek keç û xortan dixurîfînin. Wekî afyoneke veşarî dikevin bin hiş mirovên kurd û gelek texprîbatên erjeng pêk tînin. Ev radyo bi giştî xîtabî kesên apolîtîk ku hîn sosyalîze nebûne û hay ji rasteqîniya xwe û ya civaka xwe nîn in, dikin. Xîtabî qelsî û kêmasiyên wan dikin. Weşana van radyoyan sibê ta êvarê bi bernameyên pûç, vala yoz û bi galegalên vit û vala didome. Di gel vî yekê careke din van radyoyan ji xwe re potansiyeleke guhdaran peyda kiriye. Kesên ku herî zêde û bi rêkûpêk li van radyoyan guhdar dikin; ji sedî 70'yê wan keçên malan in ku, ev cûre kes jî bi piranî koçberên gundan in. Ji sedî 30'yê guhdaran jî, ciwanên lûmpen û tolaz, esnafên ku sosyalîze nebûne û şofêrên dolmîş û texsiyan in. Keçên ku le malan li van radyoyan guhdar dikin; pîraniya wan di bin tabû û pêşdaraziyên civakî de, di bin çewsandina pergala

malbatê ya feodal de tengijîne û nikarin hestên xwe, ramanên xwe wekî keseke normal der bikin, xwe rasterast îfade bikin. Hestên xwe ji ber tîrsa pêşdaraziyên vedîşêrin, bi dizîya malbata xwe, bi riya telefonê tîkîlî bi van radyoyan re datînin, qaşo hestên xwe yên tengijî der dikin. Ji ber ku asta zanebûna wan jî gelek nizm e, bi hêsanî dikevin kemîna van radyoyan. Di encamê de hestên berevajî û qilopanî di wan de bi cih dibin. Wekî mînak; ku mirov li van radyoyan guhdarî bike wê di rojekê de bi sedan sohbetên bi vî rengî bibihîze: Pêşkêşvanekî dengnexweş bî Tirkiyeye xwar û maro û şkestî, bi şewazeke lişo û şilik, bi hevokên qeşmerok anons dike. Zengilê telefonê lê dikeve Aloo... kîminle gorişiyem? Hîî...hî ben aqlayan melek (qaşo rûmûz bikar tîne), ben Hülya, Gamze, Yalnız Prenses... Pêşkêşvan! dipirse (cardin bi wî şewazî) Kendinî tanîfisen? Hî hî ben ev qiziyem on sekiz yaşındeyem, evde axşeme qeder

X. Xemgîn û hwd jî dijenîn. Ji bo ku rûyê xwe yê rastîn veşêrin û bi renekiyê kone (cinsî) xwe bigihînin nava mejiyê girseya kurdên hay ji xwe nîn in. Bi vî rengî gelek însanên me ji rastiya xwe û civaka xwe, ji şert û rewşa şerê qirêjî neheq, ji kesayetiya xwe, ji ehlaqê civaka kurd, ji çanda xwe ya xwerû dûr dikevin û dikevin nava (bê) kesayetiyeke sosret. Dema bi pîrsgrîkên rastiqîn re rû bi rû dimînin, ji ber xeriqandina vî rewşê, bêcare dimînin û li hemberî rastiya jiyane dipelişin.

Radyoyên ku di xêza qaşo îslamî de weşanê dikin, ew jî bi "Esselamuneleykum" hevokê saz dikin û bi "Allah razı olsun" jî diqedînin. A îslamiyeta! wan hew qas e. Armanca weşana ev cûre radyoyan apolîtîze kirina gel e. Di bernameyên xwe de bîrdoza senteza tirkî û îslamî dirjînin nava mejiyê gel. Bi dewletê re di nava tîkiliyên nêzik de ne. Ku her tim bûrokratên dewletê dibin mîvanên bernameyên wan. Bi giştî propaganda ya turanîzmê dikin û pesnê Osmanîyan didin. Muzîka ku di weşînin jî, qesîde, îlahî û muzîka tirkî a şovenîst e.

Metro FM, dûrî van xêzan weşana xwe didomand. Potansiyela guhdarên vî radyoyê kesên welatparêz, polîtîk û pejinkar bûn. Vê radyoyê bi awirekî demokratîk û bi şeweyekî



radyoyî dîniyem û çeyîz îşliyem siradaki perçeyî canımdan çooox sevdiğim bîrsîne gönderiyem" Tu diniherî ev keç çawa telefonê digere, îcar "Canımdan çooox sevdiğim" digere; "Benda bu perçeyî yalnız Prensesse gönderiyem".

Belê ev radyo her tim di weşana xwe de cînsiyetê derdixin pêş û dibin navgînan tîkiliyên cînsî yên jirêderketî di navbera keç û xortan de. Armanca ew e ku, ji vî şerê qirêjî ku li vî erdnîgariyê didome re xizmet bikin û kesan ji rastiya wan dûr bixin. Radyoyên arizî, ew jî ji layê xwe ve gelê kurd dixin nav gorepana sistema dagirker û bi dîwarên bilind mejiyê wan dorpêç dikin.

Muzîka ku dijenin jî, bi giştî stranên arabesk, yoz û yên pop in. Wekî M.Gürses, Emrah, İ. Tatlıses, M. Kırmızı Gül, Ö. Deniz, Tarkan... Li ber van muzîka kurdî ya wekî E. Erbanî, Beyto û yên wekî wan ên arabeska kurdî. Di nav vana de stranên Şivan, F. Tunç, Grup Yorum, Grup Kızılırmak,

kî nêzî welatparêziyê bernameyên nîqaşan û pêşbezî amade dikirin. Muzîka reşen û protest diweşand. Di nav weşana xwe ya muzîkî de bi giranî cih dida muzîka kurdî ya şoreşger. Zor didan sînorên sansûrê yên RTÜK'ê, Lê belê, ev radyo tu car jî xezeba dewletê nefilîfî. Niha jî salekê cezayê rawestandina weşanê xwariye. Seba ku di pêvejoya hîljartîneke muhtemel de nebe dengê derdorên welatparêz.

Divê êdî civaka me di her warê jiyane de reş û sipî baş binase û ji hev derxe. Divê guhdarekî radyoyê, an temaşevanekî TV'yê dema li televîzyon an jî radyoyekê guhdar an temaşê dike, baş bifikire û li ser rawestê dahûrîne. Gelo ka çî ji van radyoyan bi dest dixê û çî wînda dike? Ev radyo di xizmeta kê de ne û bi çî zîhnîyete weşana xwe didomînin? Divê gelê me xwe ji van radyoyan bi dûr bixe, wan nede jiyandin û destûr nede ku ew bi weşana xwe ya bi qirêjî û gemarî jiyana me ya paqij bilewitînin.

ROŞAN LEZGÎN/ AMED

# Rêzimanê kurmancî

- Wane 27 -

SAMÎ BERBANG

## Di lêkeran de rawe

Rawe teşeyê lêkeran nîşanî me didin. Di kurmancî de du cure raweyê hene; raweyên pêşkerî û raweyên daxwazî. Raweyên pêşkerî dema karekî nîşan didin, em ji wan tê digihêjin ku tiştek dê pêk bê, pêk tê yan jî pêk hatiye. Li aliyê din raweyên daxwazî karekî ku tê nîqaşkirin dinimînin.

### Raweyên pêşkerî

Ev rawe bi gelemperî deman nîşan didin. Mirov dikare demên ku di kurmancî de bi berfirehî tîn bikaranîn wiha rêz bike:

- 1) Dema niha
- 2) Dema bê
- 3) Dema bê ya nêzîk
- 4) Demên borî
  - a) Dema boriya têdeyî
  - b) Çirokiya dema boriya têdeyî
  - c) Dema boriya dûdar
  - d) Çirokiya dema boriya dûdar
  - e) Dema boriya berdest

### Dema niha

Heke karek di dema ku yek tê-de ye de bê kirin, dema vî karî wekî dema niha tê binavkirin. Dema niha bi alî-

kariya qertafa /di-/ û raya dema niha ya lêkerê pêk tê. Bo dimûne di mijara rayan de hatibû gotin ku raya dema niha ya lêkera kirin /k/ ye. Niha heke em li gorî vê rêpîvanê biçin em qertafa /di-/ bidin ber /k/ yê "dik" derdikeve holê, li gorî kesê ku wî karî dike heke em cînavkeke pêrebestî jî bi dûv wê bixin dê lêkereke dema niha derkeve holê. Bo nimûne ger kes ku kar dike, kesê yekemîn "ez" dê lêkera bibe "ez dikim". Çend nimûne dê têgihîştina mijarê hêsantir bikin.

*Ez di-ç-im*  
*Tu di-xw-î*  
*Ew di-b-e*  
*Em di-nas-in*  
*Hûn di-mir-in*  
*Ew di-firoş-in*

### Dema bê

Her wekî ji navê wê jî diyar e, ev rawe ji bo karekî ku hîn nehateye pê, tê bikaranîn. Dema bê bi alîkariya daçeka dema bê "dê/ê/wê" pêk tê. Qertafa /bi-/ tê ber raya dema niha ya lêkerê. Heke mirov ji lêkerên li jorê lêkera mirin bigire, her wekî ji mînakê diyar e ku raya wê /mir-/ dîsa li gorî kesê yekemîn "ez dê bimirim" derdikeve holê. Çend mî-

nakên din.

*Ez dê nan bi-xw-im*  
*Tu dê şîr bi-dos-î*  
*Ew dê kevir bi-avêj-e*  
*Em dê malê bi-şo-n*  
*Hûn dê darê bi-bir-in*  
*Ew şekir bi-hîn-e (bine)*

### Dema bê ya nêzîk

Ev dem jî wekî dema bê ye, lê di ci-hê daçeka "dê" de lêkera kirin heye.

*Ez dikim nên bixwim.*  
*Tu dikî bizinê bifiroşî.*  
*Ew dike gîskekî bide.*  
*Em dikin mehînekê bikirin.*  
*Hûn dikin mirîşkekê bibirin.*  
*Ew dikin pirtûkê bixwînin.*

### Demên borî

Ev rawe çêlî karekî ku berî niha hatiye kirin dikin. Demên bi alîkariya raya dema borî ya lêkeran û hinek qertafan tîne holê. Bi taybetî di navlêkirina demên borî de tevliheviyek heye. Li vir heta ji me hat, me da xwe ku em navên ku bi berfirehî tîne bikaranîn, bidin. Her wiha li ser hinek demên ku zêde nayên bikaranîn jî nehat rawestandî.

### Dema boriya têdeyî

Hinek kes jî vê demê re dema boriya

diyar jî dibêjin, Rêsidê Kurd jê re "nêzbuhêr" gotiye. Di waneyên berî niha de jî hatibû gotin ku dema paşgîrî raderî ji lêkerên resen bêne avêtin, li holê raya dema borî dimîne. Dema ji lêkera "çûn" paşgîra raderî /-n/ bê avêtin, li holê "çû" dimîne. Ew jî dema borî ya têdeyî li gorî kesê tek ê sîsiyan nîşan dide. Lêkerên ne resen ji bo bibin dema boriya têdeyî qertafa /-î/, /-iya/ digirin. Bo nimûne teşeya dema boriya têdeyî ya lêkera firîn "firî" yan jî "firiya" ye. Dîsa divê neyê jîbîrkirin ku di demên borî de rewşa lêkerên gerguhez û negerguhez ji hev cuda ye, lewre jî divê mirov mînakên wan ji hev cûda bide. Lewre di demên borî de lêkerên gerguhez cînavkên pêrebestî yê bireser digirin. Hinek mînakên dîtir li ser heman mijarê:

### Bo lêkerên negerguhez

*Ez di rê de meşiyam.*  
*Tu bi ku de reviyayî.*  
*Ew çima zû hat?*  
*Em ketin erdê.*  
*Çivîk bilind firiyar.*

### Lêkerên gerguhez

*Min kevir avêt.*  
*Te ez dîtîm.*  
*Wî barekî giran kişand.*  
*Me ji we re got.*  
*We ji me re çi anî?*  
*Wan ji me pere standin.*

## Nijde (1)

NEJDET BULDAN



Di demên berê de di nava kurdan de hinde gotinên taybetî hebûn. Ew taybetî jî dewlemendiya zimanê kurdî pêk dihat. Ew tiştê ku niha navê wê bûye "çete", di nava kurdan da "nijde" bû. Li ser malan, eşîran, gund û zozanan her dem xirabî û talanên nijdeyan çêdibûn. Digotin: "Nijde havête ser filan gundî, zozanê, an jî malê." Lê sedan sed nijde ji terefê axayekî an jî eşîrekê ve dihatine parastin. Kurtiya wê di demên buhurî de gelek axayan jî çeteyên (nijde) xwe hebûn. Bandora nijdeyanan li ser rewşa eşîran û tîkiliyên wan hebû. Axayên herî xurt, xudanên çeteyên xwînxwîr bûn. Nijdeyanan di talanan de bahra axayan jî dida. Lê taybetiyeke din a nijdeyanan jî hebû; dema dihatine girtin, an jî kuştin tîkiliyên wan û axayan eşkera nedibûn. An jî tu axayan tîkiliya xwe û nijdeyanan qebûl nedikir.

Dewleta tirk dibêje min çete girtin. An jî bédeng kirin. Kî bawer dike? Çete bi destê an jî harîkariya kê hatine damezrandin û

parastin? Li dijî kê hatine xebitandin? Encama çetebûnê gehîşte kîjan pêvajoyan? Niha armanca girtina wan çi ye? Gelo bi rastiye ê bédeng û xebat bibin? Û gelek pirsên din.

Nijdeciyatî, nijdeyanî di dewrê Sultanên Osmanîyan de bi destê dewletê hatine çêkirin. Ev nijdeyanên dewletê ne. Di dema kemalîstan de nijdeyên herî mezin bi destê Mustefa Kemal hatine damezrandin. Ji bo dijîtiya muxalefeta (opozîsyon) Mustefa Kemal kar kirine. Gelek nûner û kesên li dijî M.Kemal bi destê wan çeteyan hatine bédengkirin û kuştin. Çeteyan ku bi vî armançê hatiye çêkirin a herî mezin a Topal Osman bû. Kesên şoreşger, rewşenbîr û siyasîmedar bi destê Topal Osman hatine kuştin.

Di dema serhildanên kurdan de ew çetene mezintîrin bûne. Her endamê Dadgeha Serxwebûnê (istîklal Mahkemeleri) endamêkî nijdeyê bû. General Mustafa Muğlalî nijdeyan bû. Hemû fermandarên dewleta tirk yê ku, li Kurdistanê xebat dikirin serokên nijdeyan bûn. Her rayadarekî tirk, li Kurdistanê serokê nijdeyê bû. Wan jî gund dişewitandin, mirovên kurd ên welatparêz dikuştin û jin direvandin, zarokên kurd dikuştin, sêwî dihêlan. Bazirganî û qirêj dikirin. Di wan deman de jî hevalbendên wan kurdên xwefiroş hebûn.

Paşê şoreşa kurd bilind bû. Ev nijde bi destê dewletê careke din hatine bikaranîn.

Lê vî carê mercên cihanê jî hatibûne guhartin. Teknik, aborî, têgihîştin û xebatên nijdeyan, li gorî pêşveçûnên şoreşa kurd hatine nûvekirin. Hedefa nijdeyan bû Kurdistan. Axa wê, daristanên wê, kesên welatparêz, siyasîmedarên herêmî û hemû kurdîyê. Li derveyî Kurdistanê jî hedefên wan bûne siyasîmedar, rojname û rojnamevan, nivîskar, dewlemendên welatparêz, bürokrat û rewşenbîrên kurd. Li Kurdistanê, bajêr û metropolên Tirkiyeyê kurdîyê bû hedefa êrişan. Daristanên Yewnanîstanê hatine şewitandin. Li Ewrûpayê û li başûrê Kurdistanê, li paytexta Sûriyeyê Şamê gelek çalakî û sabotaj pêk anîn.

Nijde ji gelek hêz û komikên cur bi cur hatine çêkirin. Ji dewletê MÎT, TIT (hêza wan a leşkerî ye), polis, tîmên taybet, pispore û fermandarên dewletê serokên wan nijdeyan in.

Ji partiyeke nijadperest (MHP) qatil û dizan didin xebitandin. Kesên bi kurdî diaxivin jî emrê dîrokê bi cih anîn. Di nava dijîtiya şoreşa kurd de cihê xwe girtin. Ew jî serokcehş, siyasîvanên xwefiroş, serokên belediyevan, ceşş û tîrafkarên ku tînanaskirinin. Kurtiya wê nijde pispore tirk û jî qirêja kurd pêk hatin. Niha em dizanin ku çend ji wan tînan girtin. Çima tînan girtin? Encama girtina wan ê bibe çi? Ew jî ji bo nivîseke din.

*Bîranîn ji bo şehîdên Amedê yê avrêla sala 1996'an*

# Pênc pilingên Geliyê Rizê

**R**êheval Cemal (Mahmut Gün) di sala 1966'an de li navçeya Pasûrê gundê malê cêlê ji dayika xwe bû. Hê di zarokatiyê de, malbata wî hat navenda navçeya Pasûrê. Gelek xîzanî kişand. Rêheval Cemal, di zarokatiya xwe de, ked û kedkarî nas kir. Di her karî de xebat kir. Di dilê xwe de evîndarê azadî û Serxwebûnê bû. Dibistana sereatayî, navîn û lîse li Pasûrê xwend. Di xwendekariya xwe de ramana şoreşgerî nas kir.

Wexta ku têkoşîna rizgariya neteweyî li herêmê belav bû, rêheval Cemal bi rih û can beşdarî xebatên têkoşînê bû. Sala 1988'an û bi şûn de, bû milîsê leşkerî. Di sala 1991'an de beşdarî refên ARGK'ê bû. Bo peywirî hat navenda Amedê. Bûyerek li dar ket, rêheval Cemal êsir kete destê neyar. Gelek lêdan û îşkence dît, 6-7 meh di zîndana Amedê de ma. Di zîndanê de li ser bîrdoziya PKK'ê xwe perwerde kir. Di sala 1992'yan de hat berdan.

Rêheval Cemal dîsa gihîşt nav refên gerillayên ARGK'ê. Di gelek hêzên ARGK'ê de serleşkerî kir. Di sala 1992'yan de çû herêma serokatiya neteweyî, bi perwerdeyê xurt xwe gihand û dîsa vegeriya herêma Amedê.

Dest bi xebatên damezirandina artêşê û kesayetiya artêşî kir. Ewîl, di tabûra şehîd Kendal de serleşker bû. Li belê, li Girê sor, li Girê Elûnê, li Geliyê Cumatê û li Geliyê Godernê bû tîrsa dilê artêşa dagirker. Zivistanê bi serleşkerî bo damezirandina "Tabûra Apê Mûsa" hat herêma yekemîn a eyaleta Amedê. Li Girê Şela Hêyda, li

Çiyayê Sipî bû tîrsa dilê artêşa dijmin.

Di sala 1994'an de demeke kurt bû serleşkerê Eyaleta Gapa Şoreşger. Ji vir dîsa vegeriya Eyaleta Amedê. Bû serleşkerê eyaletê.

Baregaha eyaletê di çiyayên asê de ava kir. Bû pilingê Çiyayê Çewtelayê. Bû, bayê azadiyê. Li Çiyayê Gozarekê li, girê bilxurê, li girê kor, li Çiyayê Maştagê tîrs kir dilê neyar. Geliyê Azadiyê, Geliyê Rizê li neyar kir Dojeh.

Sala 1996'an di 5'ê meha avrêlê de artêşa dagirker êrişek mezin bir ser Geliyê Rizê, ser warê bazên çiya. Di nabeyna artêşa gel û artêşa dagirker de şerekî mezin rû da. Dagirker bi çil hezar leşker û tevî tank, top, balafir, firoke, panzêr û kariyerê xwe, êriş ser 200 bazên çiya, şervanên azadiyê kir. Şer 24-25 rojan dom kir.

Gelî ji leşkerên artêşa dagirker re bû wek dojhê. Lê belê tevî serleşker rêheval Cemal, serbaz Hebûn (Egît), Cemşît û Rizgar 60 şervanên azadiyê ji tevî refên karwanên pakrewanên nemir bûn. Heval Azad Serfiraz got: "Heval min jiyana serleşker Cemal hindikî be ji fam kir. Ka ji min re behsa jiyana Hevalên Rizgar, Hebûnê Dirêj, Cemşît û Egît ji bike." Min dîsa dest bi axaftinê kir:

"Rêheval Rizgar (Necdet Özalp) di sala 1973'yan de li navçeya Bismil gundê Mele Feyat ji dayik bû. Di nav şerê axa û gundiyan de mezin bû. Li hember zordestî û xwînmijiyê riçek mezin ketibû dilê wî. Ji bo tola sê hezar salan bistîne, di sala 1991'ê de beşdarî refên şervanên azadiyê bû. Hêrsa xwe ya mezin di serê neyar de




vala dikir. Di sala 1995'an de derbasî başûrê mezin bû, wexta vegeriya Amedê serbazek pir xurt bû. Tevî serleşkerê xwe rêheval Cemal li hember artêşa dagirker sînga xwe kir wekî Bedena Amedê. Wek rima Ristemê

Zal li ser dilê neyar çikiya. Roja 24'ê avrêlê ew û rêheval Cemal di eterîsekê de tevî refên şehîdên nemir bûn. (Qediya)

GIRTÎGEHA BARTINÊ




**SALIH KANDAL**  
(1979 – 31 TÎRMEH 1979)



Ji pêşengên berxwedana  
Hîlwan– Siwêregê Salih  
Kandal nemir e.


LI SER NAVÊ MALBATA WÎ  
**MEHMET, ÖMER,  
HATICE KANGAL**



Di 1977'an de ket nav refên azadiyê di 1980'yî de fermanarê Botanê bû. Di 1981-82'yan de çû Kampa Bêrûdê. Bi şervanên Filistinê re li hemberî dagirkeran şer kir. Heya 1990'î çalakîyên xwe dimeşandin. Roja 4'ê rezberê, li gundê Cibiltînê bi dagirkeran re ket şer. Ew û du heval, bi navê Sebrî û Betal şerê saetekê domandin. Di biniya Hatxê re ketin meqereyekê, ev meqere ji aliyê sîxuran ve hate tevbîtkirin. Ew tîsîmî dijmin nebûn û xwe îmha kirin.

Hevalê Hesên em te û hemû şehîdên doza azadiyê bi rêz û hurmet bi bir tînin û serê xwe li ber bîranîna we ditewînin.

LI SER NAVÊ MALBATA WÎ  
**BIRAYÊ WÎ SEBRÎ**




**QIVIRCİK HESEN**  
(4 REZBER 1990)

□ 4 rezber 1993:

**Mehmet Sincar hate kuştin**

Mehmet Sincar di sala 1953'yan de li navçeya Omeriya girêdayî Mêrdînê tê dinê. Dibistana seretayî li gundê xwe, dibistana navîn li Mêrdînê kuta dike. Li Edeneyê lîseya Teknik dixwîne. Di sala 1970'yî de dikeve Zanîngeha Gazî, beşa teknik. Ji ber bûyerên zanîngehê ji zanîngehê tê avêtin, piştî efûyê dîsa vedigere zanîngehê û zanîngehê kuta dike. Di hîlbijartina 1991'ê de, ji Mêrdînê dibe mebûs. Di 4'ê rezberê de li Êlihê di êrîşeke kontrayî de digel rêveberê HEP'a Êlihê Metin Özdemir şehîd dikeve.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 1 Rezber:

**Roja Aştiyê ya Cihanê**

Di 1'ê rezbera sala 1939'an de bi êrîşkirina Almanyayê li ser Polanyayê, Şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê kir. Ev şer 5 salan kişand û zêdeyî 20 milyon mirovan jiyana xwe winda kir. Neteweyên Yekbûyî (NY) di sala 1984'an de roja destpêkirina şerê cihanê yê duyemîn, 1'ê rezberê wekî Roja Aştiyê ya Cihanê pejirand û her sal ji bo aştiyê divê rojê de bi çalakîyan tê pirozkirin.

## Jinan banga aştiyê kir, Dewletê tahamûl nekir



Jinên ku piştigirîya "Otabûsa Aştiyê" dikin, banga piştigirîya aştiyê li hemû jinan kirin.

**B**i nêzîkbûna Roja 1'ê rezberê Aştiyê ya Cihanê li çar aliyên Tirkîyeyê çalakîyên aştiyê û çalakîyên piştigirîya vî organîzasyonê Otabûsên Aştiyê zêde dibin. Di nav vî organîzasyonê de jinan jî xwestin ku dengê xwe bilid bikin û gotin: "Eger em jin bixwazin wê aştî bê."

Roja 25'ê gelawêjê li Taksîmê polîsan mudaxeleya daxuyaniya çapemeniyê ya ku ji aliyê jinên HADEP, İHD, KESK, MKM ÖKD, YÖKD, Jûjîn, JKKE, BKİ, ÖDP û DBP'yê pêk dihat kir. Jinên ku li ser kolana îstîklalê gihîştin hev ber bi İHD'yê ve çûn û xwestin ku daxuyaniya xwe li ber İHD'yê bidin. Lê piştî ku polîs mudaxeleya wê yekê jî kir, jinên ku ji partiyên siyasî, sendîka, komele û kovaran gihîştibûn hev û daxuyaniya xwe ya derbarê "Otabûsa Aştiyê" de li salona İHD'ê dan. Berî ku derbasî salona İHD'yê bibin li kolana İHD'ê jinan bi çepikan nêzîk-tedayîna polîsan protesto kir.

Di daxuyaniyê de ev dihat gotin: "Em jinên kurd û yên ne kurd hatin bal hev. Me xwest ku em kurteşiroveya şerê ku 14 sal in dom dike, bikin. Me dît ku lêqewmin rastî yên şer em jin in. Va ne tiştên ku hatine jiyandin, va ne pirsên me û va ne daxwazên me". Belê jinan di daxuyaniyê de pirs û daxwazên xwe bi kurtasî wiha anîn ser zimên: "Zarokên me, birayên me bi tirs û xof dikevin bîst saliya xwe. Eger sewqa wan bo herêma şer derkeve, em hestirên çavên xwe ber

didin nava dilê xwe û derd û kulê xwe ji tu kesî re nabêjin. Çima? Em serê sibê çavên xwe bi xeberên 'Şehîd ketin, bi mirîtî ketin dest' vedikin.


Di ekrana televîzyonê de dil û kezeba me ji ber kesên ku di şer de çavên xwe dane der, dibêjin 'Em dest û piyên xwe dixwazin' dipirite. Çima? Dilê me li ser jinên ku di merasîmê cenazeyan de zêmaran davêjin ser kurên xwe dişewite, lê qet nayê bîra me ku rojekê dibe ku yek ji wan dayikên di nûçeyê yek ji me be. Çima? Tecawûz û cendek, îşkence û girtîgeh, yên ku winda bûne, bê malî û bê welatî, nesekîna jana dilê me, xîzaniya ku roj bi roj zêde dibe û şidet, ma ne berhemên vî şerê 14 sal in ku nayê pejirandin in? Em jin ne alîgirê şer, alîgirê aştiyê ne. Em ne alîgirê kuştina mirovan, alîgirîya jiyaneke ku hemû mafê mirovan tînin pejirandin, dikin. Em jin aştîyê ku edaletê, wekhevîyê û azadiyê tîne dixwazin. Em jin dibêjin kuştin û mirin ne çareserî ye. Em dibêjin çareserîya kêşeya kurd siyasî ye." Wekî dawî tê gotin ku jin berî ku zêde dereng bimînin di roja aştiyê ya cihanê, yanê yekê rezberê de dibêjin: "A niha aştî!"

Belê jinên ku aştîyê dixwazin daxwaz û pirsên xwe anîn zimên. Niha jî ew dê li benda jinên ku heta niha ew pirs û daxwazên xwe neanîne zimên û li bendeyî yên ku qet piştigirîya aştîyê nekirine, bisekinin.

A.WELAT/ STENBOL

**ÇAVDÊRÎ**

### Ber bi kongreya Înstîtuya kurdî ve



MİRHEM YİGIT

**D**i nav her du mehên li pêşya me, de em dê Kongreya Înstîtuya Kurdî li Stokholmê li dar bixin. Ev tê wê wateyê ku Înstîtû saleke din mezin dibe û dê du salên xwe dagire. Girêdayî vî mirov dikare çend pirsan bike û hinekî li ser bersiva wan raweste. Pirs dikarin wiha bin: Îsal înstîtûyê çi kir, çendî bi karê xwe rabû û heta bi derceyê çawa hewl da xwe ku layiqî navê xwe be?

Înstîtû bi meşa kûsî û qusûrên gelekî berbiçav be jî bi pêş dikeve û di nav dezgehên neteweyî û cihana ramanî de dibe xwedî cihekî.

Bi dilniyayî mirov dikare bêje ku înstîtû ketiye ser rîyê hêvîbex û roleke wê çêdibe. Rewşenbîr û zanayên kurd pê dihesin, rîya lêkolînerên kurd pê dikeve û dibe navendeke cazîb.

Hefteyê carekê şanogerên kurd ku bi piranî ji Başûr û Rohhilatê Kurdistanê ne û li dora mehê carekê jî nivîskar û edebiyathezên kurd berdwam li înstîtûyê dicivin, tînin ba hev û ber bixebatên afrînerî û biserûbertir de ketine nav hewleke dilxweştir. Şanoger provayên xwe dikin, nivîskar û edebiyathez jî romanên kurdî niqaş dikin, dinirxînin. Bi ber van re Kovara Avaşîn derdikeve û gihîşte hejmara nehan. Di arşîva înstîtûyê de bi sedan wêneyên ji semîner, civîn û pêşangehan di albûman de hatine rêzkirin ku jî înstîtûyê pêve li tu derên din tune ne. Her wiha di arşîva înstîtûyê de li dora 40 roportajên çendsaetî ku bi nivîskar û şexsiyetên kurd re hatine kirin dewlemendiyeke din in û berhemên vî salê ne.

Ya din em xebatkar û rêveberên înstîtûyê îro bûne xwediye tecrûbeyê bikêr û heja. Tecrûbe sermayeke wiha ye ku giş cureyên din ên sermayeyê û îmkanên din bêyî wê rola xwe nikarin bilîzin, li cihekî diteqînin, berê xwe nadin, dibin xesar û gelek caran jî bi erdê de diçin. Tecrûbeyê van mehên buhurî jî bo me dibe katalog û xezneyeke baş û nebaşyan, dike dosyayeke xêr û gunehan, hafîzeyê kombûyî û li ser hev.

Me di nav van 18 mehan de hejmarek xwedîqelemên kurd nas kirin, tîkiliyên me bi wan re çêbûn, em bûn guhdarê dîtin û pêşniyazên wan, di nav me "xwe bi xwe" de kî çi ye, kî serê xwe bi wêbêya însîtûyê diêşîne kî nae, girêdana bi nîrx û avahiyên neteweyî li ba kê çend e, kî çendî cidî ye û kî ne, şarezayî û kapasîteya heye em dê çawa tîxin kar, ne libarî û dijarî çi ne, ev aş dê çawa baştir bê gerandin, jî bo vî çî tê xwestin, me çendî jî dil û can kar kir û hwd. giş destkeftiyên vî qonaxê ne.

Niha keleporeke ku em piştî xwe bidinê, arşîveke ku em serî lê bidin û zemîneke dusalî ku lingên me pê lê dike û em dikarin avahiyê li ser ava bikin, berxizmet e. Ev ne hindik in, serçav û avdeyên bawerîya bi xwe ne, faktorên handar in.

Bi hestekî li xwe ewle, em karin bêjin ku sala li pêşya me dê çerxa însîtûyê hê tîkûztir bigere, xebatkarên însîtûyê dê bi hostayîyek hê pêşketîtir bi karê xwe rabin û kongreya îsal jî dê hê serketîtir be.

Daxwaza me ji endam û alîkarên însîtûyê ew e ku bi amadeyîyê heralî bînin kongreya îsal û bi dîtin û pêşniyazên xwe bibin rîpêşander û çareserkerên pîrgirêkan.

Hefteyên wê bê em dê endamên însîtûyê li ser roja kongreyê agahdar bikin.

# Malbateke ji Kampa Etrûşê ku jê Ferqa zîlma Roma re

Beriya ku malan bişewitînin bavê min û çend zîlamên navsere, rahiştin Qûranê Kerîm û gotin: "Ji bo xatirê Xwedê û vê Qûrana pîroz hûn malên me neşewitînin." Lê yarbayê bi navê Ali Çamurcu pehînek li Qûranê xist û dijûn jê re kirin. Piştê jî bavê min re got: "Hûn hemû Ermenî ne!" Peşî 32 mal şewitandin, pişt re jî hatin mizgefetê dane ber êgir û rûxandin.

**D**ema hevalekî jî rêveberiya HA-DEP'ê ji min re qala malbateke ku ji Ertûşê hatibû kir bi qasî 3-4 rojan min ruhê wî derxist bo em pê re hevpeyvînekê pêk bînin. Çend roj berê tevî wî û hevaleke din li quncikeke Stenbola xopan em bûn mewanê wê malbatê.

Endamên malbatê gelek tiştên ecêb, sosret gotin, lê tiştê ku bala min kişand û ku ez tu caran ji bir nakim, tevî ku 5 kesên xwe, canê xwe, birayên xwe wînda kiribûn, di çavên wan de mîna "misqalê zer" tirs û poşmanî tunebû, berevajîya vê yekê bawerîya xurt a dilê wan, li ser çavên wan digeriya.

**Kekê xelîl di destpêkê de em dixwazin herêma we, taybetiyên gund û gundiyan we hûn bibin. Piştê jî em veşerî sala 1994'an ku we dev ji axa bav û bapîran berda û derbasî Başûr bûn.**

□ Belê em ji gundê Bêgaltê (Ormançî) ne ku girêdayî Şemzînana Culemêrgê ye. Gund ji 32 malan pêk dihat û 350 kesî di gund de jiyana xwe didomand. 46 kes ango tevahiya zîlamên gund "qorici" bûn. Lê tevahiya qoriciyan jî welatparêz bûn û çeka dijmin di xizmeta partiyê de bikar dînan. Ji sala 1990'ê vir de pest û kotekî li ser gundiyan hebû da ku bibin cerdevan. Piştî berxwedana 4 salan gundiyan bi darê zorê di sala 1994'an de bi mecbûrî rahişt wan çekên qîlêr û gemar. Ji me kirî piştî ku em rahêjin çekan dê dewlet jî hew bi ser me de were. Lê mixabin piştî ku em bûn qorici jî zordariyên li ser me kêmbûn. Her dem dihatin gef li me dixwarin û em tehdît dikirin.

**Çi digotin, tehdît bi çi rengî bûn?**

□ Digotin hûn hem qorici ne û hem jî alîkariyê PKK'ê dikin. Li hêla din her dem digotin ku ew dê me bikujin û bibêjin "PKK'ê ew kuştine" roja ku "Çalakiya mezin" pêk hat qoriciyên gundê me tevî hevalan di mewziyan de li hemberî leşkeran şer dikir.

**Çalakiya mezin?**

□ Çalakiya mezin; çalakiya ku bû sedema şewitandina gundê me û destpêka penaberîya çol û çîyan û Kampa Etrûşê. Çalakiya roja 23'ê tîrmeha 1994'an pêk hat. Li derdora gundê me ew çalakiya pêk hatibû û ew roj 36 leşker û serleşkerên tirk hatibûn kuştin, helikoptereke wan jî hatibû xistin. Dotira rojê ango roja 24'ê mehê serê sibê em bi xuşe xuşa balafir û firokeyan hişyar bûn. Bi dehan firoke di ser me

re difiriyan û gund û derdora wê didan ber topan û qazanan. Me xwe avêt sitragehan. Ji ber ku gelek caran herêm ji hêla firokeyên tirk ve dihat bombekirin me ji xwe re sitrageh çekiribûn. Piştî bomberanê bi qasî 400'leşker ketin nav gund. Serbazê wan gazî qoriciyan kir. Em hemû li ser benderê civandin, gotin: "Operasyon heye!" Piştê jî me re gotin: "Çekên xwe daynin erdê" Çawa ku me çekên xwe danî, serbaz qîr kir û got li wan bixin, hebek ji wan sax nehêlin. Lê beriya ku armanca xwe pêk bînin, bi lezginî me rahiştin çekên li erdê. Serbaz tirsîya û got: "Ez di bextê we de me, hûn çi dikin, min henek kirine, em tiştêkî bi we nakin." Dîsa em xapandî piştê gotin kincên xwe bêxin, em dê kincên nû bidin we. Lê dîsa em xapîyan, leşkeran em li erdê li ser hesanê dirêj kirin. Para mirovekî 2 leşker dikir. Di vê navberê de pere mereyên me û zêrên jinan berhev dikirin. Wê rojê ji serê sibê heta banga êvarê li ber tavê, bi halekî tazî îşkenceyên pir xedar bi me kirin. Edî wîsa bûbû ku "gunehê filehan bi me dihat!"

**Pireka wî Gulistan, gotina Xelîl dibire û dibêje:** Em ji nav zîlamên cuda bûn. Em bi qasî dest diavêtin zêrên me. Digotin: "Hûn hemî terorîst in" ji ber vê yekê jî digotin "Emê xwe berdî ser we! Em dê bi we wiha bikin, wiha bikin" Dijûn bi me dikirin, di ser serên me de sîleh diteqandin. Bi navê "Xelata Eysê" pirîkek 70 salî hebû û kor bû. Me got guneh e bila ji nav me derkeve, gotin "Ew dêlek e ji we ye" û lê xistin. Piştê tevahiya xaniyan li ber çavên me şewitandin. Nehiştin ku em derziyêke xwe ji malê derxin. Beriya ku ji gund derkevin gotin: "Li vê derê em we bibin li gundên din bi cih bikin." Lê piştî ku çûn me bi ya wan nekir û em jî wê derê çûn. Pişt re balafirên wan hatin û herêma ku gotibûn: "Li vir bimînin" bombaran kirin. Me berê xwe da çîyan, em ketin bin şikeftan di nav dehl û nevalan re em derbas bûn. Di rê de bi navê Kerem İnan me gundiyeke xwe dît, serê wî di nav keviran de bû û ew kuştibûn. Jina ku diçû ser cendekê Kerem İnan gir dikir û xwe bi paş ve diavêt. Pişt re em pê hesiyên ku leşkeran gundiyeke 60 salî bi navê Aşur Seçkin jî kuştine.

**Xelîl axaftina xwe didomîne:** Di destpêka de ji xirecirê jin û mîr ji hev qetiya bûn, lê pişt re em gihîştin hev. Wê demê îşkenceyên ecêb û so sret bi me kirin. Gava ez çav bi birayê xwe ketim, jî îşkence û lêdanê min ew nas nekir. Serbaz li wê

derê navê 9-10 kesan xwend. Ji navê ku xwend 6 kes li wê derê bûn û ew bi xwe re birin. Navê wan ev bû: Kemal İzci, Cebbar Selvi, Salih Şengül, Reşit Şengül, Naci Şengül û birayê min Üsif. Piştî ku leşker ji gund derdikevin, rastî hin gundiyan din tên ku çûne Şemzînanê ku ji xwe re fîraq miraqan bikirin. Lê haya wan ji bûyerê tune ye. Ji wan 6 kesên bi navê, Cesim..., Mirhaç Çelik, Sidik Şengül, Xurşîd Taşkin, Abdulazîz İnan û Xeyrî Öztürk digirin û bi xwe re di-

çîyayan em rastî hevalan hatin. Alîkarî dane me, li ser me cil jî tunebûn, em hemû tenê bi kiras bûn. Ji xwarinê bigirê he ta cil û bergan hevalan alîkarî bi me kirin. Bi wan re em 2 rojan meşîyan. Di laşên me de birîn vebûbûn. Di nav hevalan de doxtor hebûn û birînen me derman kirin. Edî heval bi me re bûn. Bi şev em dimeşîyan, bi roj jî me îsrehet dikir. Rojên me bi wan re xweş derbas dibûn. Carcaran derdora me dihatê gulebarankirin. 21 rojan em li mintiqeya Şeladizê bi navê gundê Çemçûyê ku



bin. Ev 12 kesên ku wê rojê hatibûn birin ev 4 sal in ku tu salox ji wan nehatine girtin. Lê tevahiya herêmê dizane ku ew kuştine.

Beriya ku malan bişewitînin bavê min û çend zîlamên navsere, rahiştin Qûranê Kerîm û gotin: "Ji bo xatirê Xwedê û vê Qurana pîroz hûn malên me neşewitînin." Lê yarbayê bi navê Ali Çamurcu pehînek li Qûranê xist û dijûn jê re kirin. Piştê jî bavê min re got: "Hûn hemû Ermenî ne!" Peşî 32 mal şewitandin, pişt re jî hatin mizgefetê dane ber êgir û rûxandin. Çêlek û hêstir bi werîsan girêdan û ew dan ber guleyên xedar. Heywan di kadînan de bi saxî dişewitandin. Digotin: "Ev qobrayên PKK'ê ne!"

**Piştî wan rûdanan çîya bûn warê we. Edî we berê xwe da çîya û nevalan ne wi-sa?**

□ Rast e! wekî din rê û mecal qey ji me re mabûn? Li ser herêma Basyayê em derbasî mintiqeya Avaşîn bûn. Li serê wan

Seddama xera kiribû, man. Me dixwest ku em derbasî Zaxoyê bibin. Lê PDK rê nedida vê yekê. Ji Neteweyên Yekbûyî rêveberêkî kurd bi navê Ziya hate cem me, me xwestekên xwe jê re gotin. Wî got ku "Biryar hatiye divê hûn li Kampa Etrûşê bi cih bibin." Me nedixwest em herin Etrûşê lewre me dizanibû ku dê PDK zîlm û zordariyê li me bike. Em 350 kes bûn û me berê xwe da Zaxoyê, lê PDK hat û bi darê zorê em vegergandin. Em mecbûr man ku herin Etrûşê. Roja 23'ê rezberê wekî penaberên yekem em ketin Kampa Etrûşê. Gava em hatin Etrûşê jî bilî me tu kes tunebû. Bi tenê çend makîne û çadîrên Neteweyên Yekbûyî hebûn. Piştê hêdî hêdî Etrûş tije bû û nifûsa wê bû 15 hezar.

**Hûn dikarin qala rojeke xwe ya kam-pê bikin. Rojên we çawa derbas dibûn?**

□ Serê sibeyê em saet li 7'an radibûn. %90 kîlometreyên me hebûn. Em dicivîyan heftêyê rojekê perwerdehî hebû. Saet



# er zilma PDK'ê hatiye Stenbolê: û ya PDK'ê tune ye

di 9'an de dest pê dikir heta 12'an perwerdehiyê dom dikir. Li ser çareseriya pirsgerêkên kampê nîqaşên dûvedirêj dihatin kirin. Kesek nexweş biketa pê re her kes alîkarî dikir. Êvaran bi dorvegerî nobet dihat girtin. Li gelek taxan di çadirên mezin de li MED-TV'yê bi girseyî dihatê temaşekirin.

**Dihate zanîn ku li derdora kampê mewzî û qereqolên PDK'ê hebûn. Têkiliyên we û wan çawa bûn?**

□ Gelek xirab bûn. Wekî hovan dihatin ser me, çawa ku leşkeran bi çavên xirab li pîrekên me dinihêrtin wan bi wî çavî li pîrekan dinêrt. Dev diavêtin pîrekan, dema dihatin li nêzikî kampê av ji xwe re dibirin. Kilam diavêtin ser pîrek û qîzên me ji ber ku gelek caran pîrek û zarokan ew dan ber keviran, mecbûr man û mew-

pê kiribû, êdî nema diwêribûn vegezin. Ji tîrsa PDK'îyan. Komîteya me ya penaberan, ji ber ku ez ji tîkiliyên derve berpirs bûm, ji min re got wan li erebeyaya xwe siwar bike û di nav PDK'îyan re derbas bike, me sê pîrek û çend zarok li erebeyê siwar kirin. Me ew bir nizamiya PDK'ê û me ji wan re got: "Divê ew derbasî Mûsilê bibin." PDK'îyan ew tehdît kirin û gotin: "Hûn çima çûne Etrûşê." Dest danîn ser erebeyaya me çavên min û hevalê ku bi min re hatibû, girêdan û em avêtin bodromekê. Pêşî hatin hevalê min birin îşkenceyê. Piştê hatin cem min, hem bi min îşkence dikirin û hem jî digotin çend PKK'yî di kampê de hene. Min got tune. Çi gotin min qebûl nekir. Du kes xwe avêt ser min û li min dixistin. Min got:

*Navbera we û Neteweyên Yekbûyî çawa bû?*

□ Ji bo me fikrên wan û PDK'îyan yek bû. Me ji wan erzaq dixwest, digotin hûn wekî me tevnagerin, lewre ji destê me vala dima. Erzaq berê dihat, lê piştî ku PDK'ê ambargo danî ser me, Neteweyên Yekbûyî jî ji herêmê vekişiya. Piştî vê rûdanê êdî meydan ji PDK'ê re mabû. Belkî tu bawer nekî lê bi nav û ismê Xwedê penaberan du mehan sax bi tenê berû û pelgên daran dixwarin. Kesî ji me nikaribû derketa derveyî kampê. Gelek caran em ji hêla PDK'ê ve dihatin gulebarankirin. Ji peydabûna nexweşiyên 8 zarokan jiyana xwe wînda kirin. Di dema şerê PDK û PKK'ê de 18 penaber ji hêla PDK'îyan ve bi rêbazên hovane hatin kuştin. Ev qewmî li ber çavên Neteweyên Yekbûyî pêk hat lê wan tu tişt nekir.

*Pişre Kampa Nînovayê çêbû. Hinekî ji behsa wan rojan bikin..*

□ Gelek pêşniyaz hitin kirin. Pêwîst bû ku hin penaber derbasî Başûr bibin. Ji bo ewlekariyê şevêkê bi dizî 7 hezar kes derbasî Nînovayê bûn. Nînova ji kontrola pêşmergeyan dâr bû. Lê em bi xwe li Etrûşê man. Piştî ku Nînova çêbû, rewşa Etrûşê her ku çû xirabtir bû, pêwîst bû ku em ji wê derê derbasî cihên din bibin. Bi pêşniyazên Partiyê û di bin kontrola Partiyê de tevî 350 gundiyan me derbasî herêma Herîriyê bûn ku dikeve mintiqeya Soranê. Em sê mehan li wir man. Rewşa me dîsa ber bi başiyê ve çû. Dema di 97'an de şerê PDK û PKK'ê dîsa dest pê kir, em dîsa bi serê xwe man. Ez û birayê xwe tevî hevlekî din em hatin girtin. 43 rojan em di destê PDK'ê de man. Piştî em berdan pêşmergeyan zor li me kirin û gotin: "Divê hûn çekên me hilgirin û li dijî PKK'ê şer bikin." Me ev yek qebûl nekir. Ji nav gundiyan me du ajanên PDK'ê hebûn, her dem giliyê me dikirin. Êdî me hew îdare kir û me got: "Em ê derbasî bakurê Welêt bibin"

*Hûn çawa derbasî Bakur bûn?*

□ Piştî ku me îxaneta PDK'ê qebûl nekir me got em çekên we hilnagirin. Ji me re gotin: "Nexwe beqesitîn herin ji vir." Me got: "Baş e va ye em diçin." PDK got: "Hûn ê herin ku derê?" me got: "Emê herin Silêmaniye" lê wan digot: "Em dê wê bişînin nav tirkên", xwestin ku em di deriyê Xabûrê re derbasî Bakur bibin, lê me ev yek qebûl nekir. Ji tîrsa girtinê. Me got emê qaçax derbasî Bakur bibin. Li ser milê Diyanayê me erebe kirê kir. Li ser "Deşta Berazgîr" me berê xwe da mintiqeya "Gerdiya Şemzînanê" ji bo ku leşker me hemûyan bi hev re nebînin, em ji kam-

Hevalê min digot: "Ji bo xatirê Xwedê, ji bo xatirê pêxemberan!" digotin "Xwedê tune ye, pêxember jî çûye iznê" wê gavê hevalê min digot: "Nexwe bidin xatirê Mele Mistefa" digotin: "Mele Mistefa cehenemiye", Mesut Barzanî dibêje wiha bikin!.."

yonan peya bûn û ji hev belav bûn. Hinek ji wan li Başûr man, em ji Gerdiyê hatin Şemzînanê.

*Gava hûn hatin şemzînanê dewletê bi çaveke çawa li we penaberan nihêrt?*

□ Di destpêkê de gotin: "Ji ku derê hatine bila siktir bibin dîsa herin wê derê." Giregire Şemzînan ku hin ji wan nezîkî dewletê bûn ev yek qebûl nekirin, gotin "bila bimînin, jixwe Xwedê bela xwe daye wan". Demeke kurt dengê xwe nekirin. Lê beriya Newroza îsal bi 15 rojan, êriş birin ser penaberên ku ji Etrûşê hatibûn. 6 kes ji wan girtin îro ji wan 5 kes girti ne, navê wan ev in: "Arif Çelik, M. Salih Şengül, Musa Taşkın, Şerif Çelik û Xemgîn Samur. Ew niha di Hepsa Erdişê de ne.

*Hûn mecbûr man ku werin Stenbolê... Bi çi awayî hûn hatin?*

□ Ji ber ku wê rojê em ne li navçeyê bûn, em li gundekî welatparêz bûn. Em ji girtinê xelas bûbûn. Lê li me jî digeriyan. Xeber hat gund gotin ji vê derê herin, nexwe hûnê bîn girtin. Em ji mecbûr man, çar meh berî îro di meha avrêlê de em hatin Stenbola xopan ku xwedê xira bike!

*Niha rewşa we li Stenbolê çawa ye. Hûn debara xwe çawa dikin?*

□ Ez emeletiyê dikim. Birayê min Suat di cihê ku keştî (gemî) kar û bar hildidin û datînin ango di tersxaneyekê de dixebite. Pîreka min serê sibê heta êvarê di karê konfeksiyon û dirûnê de dixebite. Heger tiştê bikeve destê me, ez ji birayê xwe yê girtî û ji 19 biraziyên xwe ku bavên wan hin jê wînda ne û ji dayîka xwe re dişînim. Rewşa Stenbolê ne cihê jiyane ye. Heft xwezî bi welat û ne bi vir. Heger min zanîba ku ez nayê girtin, bi şahê Nexşebend û Qurana Qedîm, nanê me kevir, giya û ber bûna ez deqeyekê jî li vir nedimam.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



ziyên xwe rakirin birin li cihên hîn dûrtir danîn. PDK'yî her dem li ser hinceta xwe bûn. Digotin dev ji wan berdîn, werin bikevin bin baskên PDK'ê.

Ji ber ku di kampê de me nizamiyên xwe ava kiribûn û nobet dihatê girtin, PDK'yî bi dizî di çolan re diketin nav kampê. Tu kesî guh nedida PDK'îyan, lê 7 mal hebûn ku PDK'yî yan ew bi pereyan kiribûn, ajani ji wan re dikirin. Em bi wan hesiyan û me ew qewirandin. Ji dorhêla Şernexê bûn. 7 kes kampê revandibûn û ew wînda kiribûn. Di sala 1995'an de Partiyê berê xwe da wan û li wan xist. Di 28'ê gelawêjê de şer dest pê kir, haya penaberan jê tunebû. Hew me dît ku PDK'îyan dora kampê girtine ji me çend kes çûn cem wan, me got "xêr e!" gotin "şerê me û PKK'ê dest pê kiriye" me got: "Baş e, hûn çi ji me dixwazin?" Gotin: "Hûn jî hemû ew in"

Rojekê çend heb pîsmanên penaberan ji Mûsilê hatibûn kampê. Piştî ku şer dest

"Wek hûn min bikujin jî, ji min re ne eybe, lê mixabin ji bo we ev eybeke mezin e." Cigare di stûyê min de tefandin, ava germ a çayê bi ser min de rijandin. Piştê re ez û hevalê min avêtin bagaja erebeyê û betaniyek avêtin ser me. Em birin navçeya Etrûşê, emniyeta wan tim îşkence bi me dikirin. Heta 27'an min hejmart ku dar li hevalê min dixistin. Hevalê min digot: "Ji bo xatirê Xwedê, ji bo xatirê pêxemberan!" digotin "Xwedê tune ye, pêxember jî çûye iznê" wê gavê hevalê min digot: "Nexwe bidin xatirê Mele Mistefa" digotin: "Mele Mistefa cehenemiye", Mesut Barzanî dibêje wiha bikin!.."

Welhasil îşkenceyên ku leşkerên tirk û PDK'îyan dikirin ji hev zêde ne cuda bûn. Her tim ji me re digotin: "Heft xwezî bi MÎT'ê û ne bi we, em birin Dihokê avêtin hepsê, li wê derê 6 meh û 16 rojan em girtî man. Hevdîtin ji bo me qedexe bû. Piştê agirbest çêbû, bi riya tirampyê em berdan. Partiyê hin PDK'yî berdabû, PDK'î jî em berdan.

# Tirsa 15'ê gelawêjê di dilê wan de hilnedihat


Dîgor navçeyê Qersê ye. Ev navçe li cihê stratejîk e. Di navbera navçeyên Qulp (Tuzluca), Qaqizman û bajarê Îdirê de dimîne. Çiyayên Agirî û Çemçê (Qaqizman) ji wir bi awayekî zelal dixuyên. Dîsa çemên Erez û Ava Reş li seranserê herêmê, wekî hevalcêwî diherikin û li cihê tevlihev dibin. Dema ku mirov ber bi bakurê herêmê ve diçe bajarê Rewanê û Çiyayê Elegezê nêzîktir dibin. Di tevahiya navçeyên Qersê de hema bibêje kurd û tirk ligel hev dijîn. Lê mirov dikare bibêje şênîyê Dîgorê ji sedî 99 kurd e.

Ev navçe ji aliyê sosyolojîk ve ji hêjayî dahûrandinê ye. Bi dehan eşîrên kurd ligel hev dijîn, pirdengî û pirrengiyeke civakî heye. Eşîrên mîna Milî, Birûkî, Redkî, Celalî, Dilxêrî, Sipkî, Kazkan (Torin), Kirdasî, Kurdkî, Cemaldîn ku ji herêmên cuda yên welêt hatine, li navçeyê bi cih bûne. Her wiha, her çiqas hejmara wan kêmbê ji divê mirtib neyêne jibîrkirin. Ev pirdengî di devokan de jî tê dîtîn, di axaftinê de şeweyê hemî eşîran jî hev cuda ye.

Dîgor jî wekî tevahiya Serhedê bi salên nodî re kete bin bandora têkoşîna azadiyê ya nûjen. Bi hatina pilingên azadiyê re di mêjîyê mirovan de çirûskên berxwedanê pêketin. Dilê mirovên vê herêmê yê ku bi dehan sal bi tirs û xofa Roma Reş zeng girtibû, bi tîr û tîrêjen rizgariyê yên geş re hêdî hêdî veheliya û paqij bû. Têkoşîna pîroz wekî keskesoreke ku di encama baraneke ku hewayeke sayî de baribe derketibe holê, li qeraxên asîmanê welêt dibirûsand.

Di nava şênîyê vê derê de baweriyek heye; li gorî vê baweriyê dema keçek xwe di ser keskesorê re bipengizîne (biqewizîne) aliyê din, dibe xort, her wiha heke xortek heman tiştî bike dibe keç. Lê êdî rengê vê baweriyê guherîbû û baweriyêke din di serê mirovan de bi cih bûbû; êdî heman rewş jî bo azadbûn an jî bindestbûnê derbas dibû. Bi vê baweriyê bi sedan keç û xortên ku bi serpêhatiyên bav û dayikên xwe hovîfî û çavsoriya neyar nas kiribûn bi rik û hêrsa ku di dilê xwe de hewandibûn, xwe gihandin çiyayên bilind ên Welêt.

Vê guherîna ku di warê ramyarî de rû da heman demê xwe di warê jiyana çandî û civakî de jî da der. Reng û şeweyê pêwendîyan guherî, pevçûnên di encama berjewendiyên biçûk de derdiketin holê wateya xwe winda kir. Di nav gel de têkiliyên aştiyane geştir bûn. Her wiha rengê dawet û şahiyên şênî guherî. Di van şahiyên de ligel stranên gelêrî stranên şoreşgerî û welatparêzî hatin gotin, mijar û naveroka pêkeniyên guherî û rengê şer û jiyana gerilayan xwe dayê. Berê gel bo şoreşgeran bi piranî peyva "telebe" bi kar dianî lê êdî dev jî vê peyva marjînal a ku ji çepgirên tirk mabû, berda, li şûna wê tîgînên nû rûniştin. Bo nimûne, heval, gerîla,



"Yên şevê", "Yên çolê", "Kurap" û hwd.

Piştî kurtedemekê li herêmê li dû hev bi dehan livbazî pêk hatin. Her livbazî wekî bayê brûskê li neyar diqelîbîn. Piştî her çalakîyê pest û çewsandinên dewletê ên li ser gel jî zêde û gur bûn. Bi sedan mirov jî hêla dewletê ve hatin girtin, îşkence xwarin û hatin kuştin. Ligel dilgeşî û kêfxweşiyê di encama çewsandin û zordariyên neyar ên navborî de zivêrbûn û hêrsa gel jî gihîştibû asta herî bilind. Diviyabû bi awayekî, gel, ev hestên xwe der bibirina. Gerîla jî jî ve yekê haydar bû û dizanibû ku gel hatiye wê asta stewîna polîtîk. Ew pêlên ku xwe dabûne keviya dilê gel, pêwîst bû ku li çeperên neyar biqelîbiyana. 14'ê gelawêjê, sal 1993 bû. Berbangê, mizgîna raperîneke pîroz bi xwe re dianî. Pilingên azadiyê gund bi gund, war bi war geriyabûn, ji bo serhildaneke nû hemû amadehiyên xwe qedandibûn. Li benda berhema xwe ya ku bi ked û hewldaneke mezin afirandibûn, bûn. Ji gundên hawirdora Dîgorê şênî wekî lehiya biharê ku bi belekiyên berfê mezin û gur dibe pêl bi pêl ber bi navenda bajêr diherikî. Çiyayê Agirî li Serhedê piştî serhildana ku di dergûşa xwe de hewandibû dê careke din bibûya şahidê serhildaneke rewnaq. Gel bi dilgeşî û hestiyariyê payeberz Çiyayê Agirî silav dikir û bi çavên xwe peyameke wiha didayê: Tu her serbilind û bi rûmet bî, em dizanin ku tu dîlkovan û biêş î. Lewre kedxwar li ser bilindahiyên te, nixrên me yên pîroz bînpê kirine û li ser lûtkeya te "Kurdîstana xeyalî di vir de veşartî ye" kolaye. Me ev jî bîr nekiriye û em te rûreş demaxin. Gel bi cil û bergên gelêrî, bi rengên neteweyî xwe xemilandibû, bi slogan û stranên şoreşgerî, bi tilîliyan hest û ramanên xwe dianîn zimên. Êdî

xwepêşandanê dest pê kiribû, girse hêdî hêdî nêzîkî navenda bajêr dibû, serî li seriyên diqelîbî, te xweli biavêta, li erdê nediket. Neyar li mintiqeya bi navê Kaniya Yaşer ku bi kîlometreyekê ji Dîgorê dûr e bi leşker, polîs, tîmên taybet û tank û zerîpoşên xwe wekî ku li benda artêşeke çekdar be, kemîn danîbû. Lê girse bê çek û rext bû, bêparastin bû, di destê mirovan de şiv an jî keviyek jî tunebû. Çeka herî mezin dirûşmeyên wan û bedena wan a tazî bû. Lê gurên har di kemînê de bi bêaramî û bi fişefîşa pozên xwe li hêviya nêçîrê bûn. Lewre ew nêçîrvanên mirovan bûn, xwînmij bûn, bêyî rêtina xwîne nîkaribûn bijîn, xureka wan her dan xwîna mirov bû. Wekî ku tê zanîn gur sewalên hov in, ev di giyana wan de heye, xwediyê kakilekî hovane ne. Jixwe gurgeboz jî her dem li xwe mukir tîr û dibêjin em neviyên guran in. Bi rastî jî wê rojê jî yek peyitandin. Bi dîlegûra maka xwe re serbilindbûna xwe nîşan dan. Tirsa 15'ê gelawêjê di dilê wan hilnedihat. Lewre 15'ê gelawêjê bo kurdan ji nû ve jidayîkbûn bû, di mêjî de zellalbûn, di derûniyê de ji nexweşiya sedan salan filitîn bû. Bo pêkhatina cihanê teqîna mezin çiqasî girîng bû, bo kurdan jî guleya yekemîn ew qasî girîng bû. Ji agirê felatê xwe şûstin û xwe afirandin bû. Ji ber vê ev yek di dilê neyar de bûbû kul û wekî kula di mêjîyê Deheq de her mezin dibû. Bi mezinbûna kulê re ew sûr dibûn.

Jixwe ji mêj ve amadehiyên qirkirinê kiribûn, ev xwepêşandan tenê bûbû hincet. Ji nişka ve bi teqînê re berik wekî zîpîkê bi ser gel de dihatin. Jin, zarok, kal, pîr bi hewla ruh bi vî alî bi wî alî de direvîn. Lê gurgebozan dora gel wekî tora tevnepîrikê bi guleyên polayî honandibûn. Refek gurên çile yên birçî li gel qelîbîbû, êdî gel

derfeta filitîne nedidît. Xwîna mirovan wekî çilkên baranê dipekiyan ser dar û devî, kevir û kuçan. Hawar û qîrîna dayikan nalîna birîndaran bû. Yên nixuriyên xwe yên zarokên xwe yên berşîr winda kiribûn, qîzên çeleng, bûkên nûzewicî, xortên dest bi hine... Gure gur, teqe teq, bêhna goştê mirovan ê şewitî, zarokên di nav xwîne de gepîçî, bahoza xweliyê, mij û dûxan, te digot qey dojehe e. Bi rastî jî gel wê rojê li benda çavsoriyê ewqas erjeng nîn bû. Belê kêmbê zêde ji rastiya Romê haydar bûn, ji bav û dayikên xwe çiroka Dêrsim, Geliyê Zilan, Agirî bihîstibûn. Li Dêrsimê jî zarokên pêçekê bigire hetanî kalên nod salî çawa bi singûyan hatine kuştin, keç û bûkên çeleng jî bo ku nekevin destê neyar çawa xwe bi zinaran werkirine, Geliyê Zilan çawa bi xwîna bav û kalên me sor bûye. Hemû bihîstibûn. Lê di navberê re heftê sal bihurî bû, di heftê salî de kevir jî nerm dibin, bi vê ramanê digotin dibe ku dijmin jî hinekî nerm bûbe û rehm ketibe dil. Lê di heman kêliyê de ev ramana wan bi serdanpê guherî û tîgîştin ku "erd dibê bost, dijmin nabe dost". Di encama vê qirkirinê de bi dehan mirovan jiyana xwe ji dest da û bi sedan mirov birîndar bûn.

Wê rojê yanê dîsa di heyva gelawêjê de ji asîmanê şîn ê welêt gelek stêrkên gelawêjê xuricîbûn û yên mayîn li pey wan şîn dikir. Suriştê hêdî hêdî reng û drûvê xwe diguherand, terî diqulîbî hişkîyê, zerahiyê zora şinahiye dibir. Dar û devî, qîrş û qal bi per û bask bûbûn û bi bayekî sivik re wekî çûkan difiriyan. Belê êdî xwezayê jî bo demsala bi kovan û xemgîn, payizê amadehiyên xwe dikir.

MEMED SERHEDÎ

### Li Navenda Çanda MEDKOM'Ê

● 30.08.1998 yekşem: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:15.00

### Li Navenda Çanda Tohumê

● 29.08.1998 şemî: Gotûbêj:

"Li ser pergala dinê ya nû"

Beşdar: Temel Demirer

● 30.08.1998 yekşem:

Film: 'Hunda', saet:18.00

### ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



### Li Navenda Çanda Bulunmaz

● 29.08.1998 şemî: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:15.00

### Li NÇM'ya İzmirê

● 29.08.1998 şemî:

Roja xwarinên kurdan ên kevneşopî ya 25'an.


Konsera Hozan Cezmî

● 30.08.1998 yekşem:

Konsera Koma Agirê Zerdeşt "Dara jîmê"

## Nivîskar û Rewşenbîr Mihri Belli: Îro dema şoreşa neteweyan e

Salona panelê ya Navenda Çanda Alternatîfê bi pîrbûna temaşevanan bal kişand. Belli li ser piyan axaftina xwe kir.



"Di 1910'an de me digot serdema şoreşa sosyalîzmê ye. Şoreş bi doza sosyalîstî bi ser diketin. Îro dem ne dema çêbûna şoreşên sosyalîzmê ye. Ev dem dema çêbûna şoreşên Neteweyî ye. Û wê şoreşên bi vî awayî çêbibin. Şerê li kêleka me, vê yekê nîşanî me dide. Lê şoreşên ku di bin navê neteweyiyê de çêbibin divê di demeke kin de xwe ji burjuwayê xelas bikin. Ger xwe ji burjuwayê xelas nekin wê têk biçin."

Di 23'ê meha gelawêjê de li Navenda Çanda Alternatîfê di panela bi navê "Welatparêzî û Înternasyonalî" de nivîskar û rewşenbîrê tirk Mihri Belli raman û nirxandinên xwe anin zimên.

Mihri Belli li ser dîrokê sekinî û bal kişand ser şerê avakirina komara tirk. Wî daxuyand ku, kurdan û tirkan komar bi hev re ava kirine û wisa got: "Ew şer ji bo qedera kurdan û tirkan bû. Berî 1919'an M. Kemal li Havzayê bi bîst kesên heyeta Ûris re du hefteyan danûstendinek kiriye û ketiye Îtifaqê. Ûrisan got ku 'Ger hûn li dijî împeryalîstan şer bikin emê piştgiriyê bidin we' û dûre M. Kemal derket Samsunê. Wê çaxê dîsa M. Kemal name ji serok-êşîrên kurdan re şand û bi wan re jî kete îtifaqê. Lê îtifaqa wan, îtifaqek wekhev bû. Di çêbûna komarê de keda kurdan û tirkan bi hev re heye."

Nivîskar û rewşenbîr Belli, serhildanên kurdan ên berê û berxwedana niha, dan ber hev û wisa şîrove kir: "Serhildanên kurdan ên berê bi feodalî bûne. Tevayê kurdan ne girtine bin bandora xwe, ji ber wê bi ser neketine. Lê di navbera berxwedana îroyîn û serhildanên berê de ferq heye. Berxwedana îro hemdem e. Li gor demê gav diavêje loma her cihî dihejîne. Ji ber ku di riyeke rast de ye, li gel ewqas zordariyan, gava xwe paş de navêje û her tim bi pêş dikeve." Belli li ser asimilasyona gelên emerîkî û gelên kurd jî rawestiya û da zanîn ku, desthiltadarên emerîkî çermesor bi tenê di qetlîfaman re derbas nekirine. Ew di kampan de kom kirine û ambargo danîne ser wan. Rayedarên emerîkî gelê çermesor bi riya vê ambargoyê birçî hiştin û ew bi nexweşinên xedar

rû bi rû man." Herwiha Belli rewşa gelê kurd û ya gelê çermesor da ber hev û got ku, kurd bi asimilasyonê naqedin û bi zorê asimilasyon tiştêkî bi dest naxe. Wî wiha berdewam kir: "Divê em yekîtiyê biparêzin."


Belli dîtina xwe li ser firehkirina Misaki Mili jî bi vî awayî anî ziman: "Eger em yekîtiya kurdan û tirkan biparêzin sinorên Misaki mili paş de naçin, bi vê yekîtiyê wê Misakî mili pêşvetir biçê." Li gorî ragihandinên Belli di hevdîtinek navbera wî û Nivîskar Mahmut Baksi de li Tirkiyê cara yekemîn wî qala meseleya kurdan kiriye. Belli axaftina xwe ya li ser rêxistinên kurdan wisa domand: "Di salên 1970'yî de gelek rêxistinên kurd hebûn, lê yek ji wan nema. Wê çaxê PKK biçûk bû, bi polîtîkayên xwe yên rast îro mezin bû. Ez vê berxwedanê diparêzim. Ji ber ku ez vê berxwedanê diparêzim karê xwe yê welatparêz bi cî tînim. Karê xwe yê enternasyonalî bi cî tînim."

Mihri Belli axaftina xwe bi gotinên şoreşgerêk frensî qedand: "Pîrbûna welatparêzî nêzikbûna înternasyonalîyê ye, hindikbûna welatparêzî jî ji înternasyonalî dîrketin e. Tu çiqas ber bi welatparêziyê ve biçî, tu ew qas ber bi înternasyonalîyê ve diçî, tu çiqas ji welatparêzî dîr bikevî tu ew qas jî ji înternasyonalîyê dîr dikevî."

C. ANDOK/ STENBOL

### TÎŞK

## Ke zimanî çek dête go



### BEKÎR ŞIWANÎ

Netewey Kurd çend hezar salêk e le ser xakî bab û bapîrîni xoy deji û be hemû şeweyek bergirî le bûnî xoy kirdiwe û tiwanî-wêti dirêje be jîyan bidat û ziman û kulturî dewlemendî xoy eger pêşîş nexistibê, ewa tiwanîwêti biparêzê. Herçende nixî xoragirî û peywest bûn be xakewe zor giran kewtiwe le ser gelî kurd, belam encam rêgirtin buwe le tiwanewey netewey kurd. Wate detwanî bilêyn ke ew geley emro pêy dewitrê kurd, le akamî şewazî cûday xebatî bêwîçan û qûrbaniyanî berdewam bem qonaxey mêjû geyîştîwe. Helbet legel pêşkewtinî mirovayeti û zanîst û aloz bûnî biwarekanî jîyan da, hewlî tiwanewey netewey kurd perey sendiwe û sêwazî niwê û tirsinak û karîgerî be xowe girtiwe. Ewîş le ber ewey amrazekanî bekarhênraw le tiwanewe û lenawbirdinî gelan da, wekû caran nemawe û ewîş beşî xoy le pêşkewtinî zanist dapîçirîwe.

Eweta diway damezrandinî Komarî Turkiye, gewretirîn beşî netewey kurd le serûy Kurdistan kewte ber çewsandinewey bêsinûr û dest kira be cêbecêkirdinî nexşey tiwanewey em gele le botey ziman û kulturî turkî da. Eger be rapirîni çekdaraney 14 sal le mewberî şorişgêrekanî bakûrî Kurdistan pêş le proseêsi be turk-kirdinî kurd negiraye û giyanî kurdayeti nekrayetewe be ber rolekanî ew gele da, ewa pêşbînî nedekra emro kurd le çî rewşek da debû demewê lem derwazeyewe bême ser basî yadekî mêjiyî ke mangî rabirdû be serman da têperî, wate yadî 14 saley rapirîni çekdarî le bakûrî KurdistanPariyê Karekeranê kurdistan (PKK), le nawerastî heştakanî em sede ye da dête ser ew bawerey ke tenya rêbaz bo ragirtinî prosêsi sirînewey kurd le mêjû da, helgirtinî çek û teqînewe ye be rûy dagîrkeran da. Şorişî bakûrî êmeş wekû şoriş û reperîne çekdariyekanî zorbey şiwênekanî çîhan, be jimareyekî kem dest pê dekat û paşan pelûpo derdeka û hemû Kurdistan û herêmeke detenêtewe. Masum Korkmazî naesraw be Agît rojî 15'î ab (tebax)î salî 1984 be teqandinî yekem fişekî dest-pêkirdinî şerî çekdarî, netewey kurdî gerandewe ser şanoy mêjû û rewrewey dîrokî Kurdistanî wergerand. Agît û hawrêkanî ke rêbazî em şewazey xebat û têkoşanyan darişt, jimareyan le jimarey desteyekî biçûkî gerillay emrojgare ziyatir nebû. Belam be têperbûnî kat û qalbûnewey rolekanî gelî kurd le naw botey şoriş da, kurd bû be xawenî gewretirîn supay şorişgêr le ser astî hemû çîhan. Supayek ke le ser zemînekî req rawestawe û lûtî nawe be lûtî duwemîn supay NATO'we û dakokî le hebûnî kurd dekat. Pitewî birwa be rewayî kêşey kurd û rûbarî xwênî şehîdan, tijêşuy gerilla ye le rêga da berew asoy xorî azadî û serbexoyî niştîmanî hezeran saley kurd.

Supay Rizgarî Gelî Kurdistan ARGK'be raberayet PKK, le katêk da pê denête pazdemînî şerî çekdariyewe, ziyad le wey ke buwe be lemperêkî gewre le beranber lafawî tiwanewe û lenawbirdin, gelî Kurdistanîş berew asoy serkewtin debat.

# Strana evîndariyê Biharê

Bihar e, bihar e biniya vê beriyê  
Malxo wê gazî dîke kevaniyê  
Tu ji min re bîne bizinoka doşaniyê  
De tu ji min re bîne kepenê şivaniyê  
Tu çêbike seriyoge penîriye  
Ezê bibim ji bo mêrikê kirmaniciyê  
Belkî wê bide me ebdala Xwedê  
Rêgîka bi gemiyê (destûr dayîna kelga  
ser şetê Cizîrê)

Eger rêgîka gemiyê neda me,  
ezê  
hêdî, hêdî ji dilê xwe yê kul û  
helak re dagirim gemiyana bi  
deştiyê  
Wele min nizaniba taliyê min  
keçîka koçerê  
Mêrikê min bo min kir neyariyê

Heyla li min jarê,  
Heyla li te jarê  
Heyla li min rûşê, şermezarê  
xelk û aleman hemû bo xwe girt  
dost û yarê  
Îsal heft sal tamam e lawikê  
min ebdala Xwedê di hepsê de  
qirêj xwarê,  
Ez biçim xelq dê bê(je) hey lê  
yarê  
Ez neçim heyla li min rûşê,  
şermezarê!  
Çend xêr û xweşî min û  
lawikê xwe dîtî(ye) hemû hat û  
raborî

Keçîkê hatî berî Kêre  
dibê harî Kêrewo  
Serê te bilind e, binê te xilole  
wo (vale)  
Hey çend gilî û gazindê min û  
lawikê min li ser stûyê te wo  
Ma te nizanibû koçerê Rewan-  
diyan danîbû biniya te wo

Kêre wê dibê:  
Here keçîkê mal û malbav xi-  
rabê  
Xwedê pê (di)zane min nezani,  
min bîzaniba min dê  
Serê xwe rakiriba, biriba ber  
ezmanê min dê kurîga (kuriya)  
xwe şor kiriba biniya heft beh-  
ranî  
min nedihela ne koçer hîlborîn  
ne rêwîngî û ne zozanî  
(dîsgotin)

Kurik dibêje xwezî ez û keçîka  
delal pêk ve ketiban Berwarê  
ser bi çilo.

Kurikê aşiq dibêje, xwezî ez ji keçîka  
koçer re bibama qurmilo.  
Bila ez danîbam ser milê xwe birîbam  
sûka Cizîra Botan  
min bidaba bi piçek kilo,  
wextê keçîkên Cizîra Botan diçine gêri-  
ya dilane

Bila keçîka koçer ez bi çavê xwe yê ras-  
ti ve îna bam  
bila çavê çepê bimaba wilo

(dîgotin)

Keçîka koçer dibê gelî yarî biran  
Werin harime emê rêgîka Kêreyî çêbi-  
kin

kelegvano  
Tu kelega xwe ji min re bavê ser defa-  
nan  
Xelk û alema, Xwedê ide te serigê bîst  
perano  
Ezê bidim te elbîkê van zêrano de tu  
min û  
Lawikê min xelas ke bi kefil û deman a

Kelegvano dibêje: Erê keçîkê  
mal û malbav xirabê  
Ezê kelega xwe ji te re biavêjim  
ser defano  
xelk û alem dîte min serig û bîst  
perano  
min nevê elbîgê te yê bi zêrano  
Ezê te xilas (bi)kim bi kefil û de-  
mano  
nêbana (navber) min û te ewe tu  
bide min ramûsanek ji nêbana  
her du memkan o

Keçîk dibê gelî yarî û biran bêri  
xwe (mêzebikin) bidine  
Ev kelekvan çend ji tuxmê keran  
e  
te tîrek li bejna min dabû, tîreke  
du kevan e  
Ser tîra vê tîrê di mêlaka (kezab)  
min xuya ne  
ma te bihîstiye ramûsanên dost û  
yaran wisa belaş û erzan e  
Ramûsanên min ebdala Xwedê  
ber dilê lawikê min heft xwînkari-  
ri<sup>(1)</sup> bezê mirowan e, heft kod<sup>(2)</sup>  
şîrê teyrana e, heft mil şaxê kera-  
n e, heft kerî mihên ser kodan e  
heft kerî çurên (li)ber cewan e,  
heft sed can e, hêstirên ber bara-  
n e  
Here pirsyara lawikê min ebda-  
la Xwedê bike dê/wê (bi)bêje be-  
laş û hêj erzan e


Dîsgotin

Erê keçîkê emê te bidin mêrikê  
Cizîrê xudanê qesrikê  
vê qusurê xudanê rawik û bi tey-  
bîrê

Keçîk dibêje Xwedê ritba (rutbe)  
mîr mezin (bi)ket min nevê Mîr-  
ke Cizîrê, Xwedê xirab qesrik û  
wê qusurê ezê çi jê bikin ra(wik)  
û bi teybîrê  
min divê ez û lawikê xwe ebdala  
Xwedê serî milika zêrek derbêra  
şivan û bêriyan em vexwine ko-  
dikê berf û şîrê.

HERÊM: ŞIRNEX  
Berhevkar: SEYDA GOYAN

1-2 Amûrên pîvanê.  
çur: bizinên tiftik



Ezê rabim pê dûvika teşîya xwe axê bi-  
kolim  
Wextê ez û lawikê xwe ebdala Xwedê  
dagerin deştê de em keyf û henekên xwe  
lêkin

(dîsgotin)

Keçîk çûyî ber kelegî dibê erê kelego

## BIWÊJÊN KURDÎ

1-Beşervekirî: cirxweş, ( Mamê  
Eskender mirovekî beşervekirî  
ye.)

2-Çi ga û gîsinê we ketine ber-  
hev: Hey xwedê xezeba xwe bi  
we bike, çi ga û gîsinên we ketin  
ber hev. (Neyî paylaşamiyor-  
sunuz?)

3-Ji pêla xwe nehatin xwarê:  
Ji ya xwe nehatin xwarê. (Hehey  
ez bavê Şawo me, ma ez ji pêla  
xwe tême xwarê.)

4-Jê re kap avêtin: Li Başûr  
Sedam ji Barzanî re kapa diavêje  
(aşikatmak)

5-Ji şêran re 'pîso' gotin: Şişş di  
hedê xwe de bisekine, mala  
'filankes' belaxur e, ji şêran re  
dibêjin 'pîso' (bêtirs û xof)

6-Digotin xebero: Digotin xebero  
li Sasûn dîsa gund hatine Şewi-  
tandin.

7-Keser vedan: Pîra Hizna  
kesereke kûr veda. (iç geçirmek)

8- Li hemana ye: Deweleta tirkî  
li hemana ye, ha hilweşiya ha  
hilweşiya. (li ber hilweşinê ye)

9- Mû jê bernedan: Belqitiyo  
mû ji bavê xwe bernedaye.

10- Mû ji xwe şaşnekirin: Bavê  
wî jê tasek av xwest, wî mû ji xwe  
şaş nekir. (Xwe tevnedan)

11- Mû li zimên nehebilîn: Tu  
dibê qey ebûqat e, mû li zimên  
nahebile. (Dilinde tûy bitmek)

12- Paresî qalind (stûr): Qure,  
nefs mezin. (Tu dibînî, çi paresî  
qalind e, alîkariyê ji xalê xwe  
qebûl nake.)

13- Paxav jê nekirin: Ev Elo ye,  
paxavê ji tu kesî nake (umur-  
samak).

14- Pirçonek ji laşê mirov çûn:  
Dema min gundiyan Banê yên  
hatibûn sotin dîtin, pirçonek ji laşê  
min çûn, çi sosret bû.

15- Te ne bawer be: Te ne bawer  
be, ev hikûmet jî ji kêşeya kurd re  
çareseriyê bibê.

16-Te heye: Te heye îro polis  
bavên ser mala me. (İstermisin)

17-Tu nabêjî: Tu nabêjî ew jî  
cahş bûye.

18-Xweziya xwe pëanîn: Gipta  
etmek) Wan mirovên bi zimanê  
xwe perwerdehiyê dibînin, timî  
kurdan xweziya xwe bi wan aniye.

19-Xwedê giravî: qaşo (Emero  
ka xwedêgiravî tu dihatî cem me.)

20-Xwedênegiravî: Xwedê negi-  
ravî dewletê PKK diqedand.

21-Qebê xwestin: Navtêdan (Li  
Cûdî hevalan qebê ji leşkerên  
tirkî dixwestin.)

Amadekar: MIHEMETŞAH XWENAS

# Fîlozofekî ku di wê deme de, di vî warî de nehatiye naskirin Ji destê xanî, ji platon re du baq gul

Înstîtuya Kurdî pirtûka bi navê "ji destê Xanî, ji Platon re du baq gul" di demek nêzik de derxist ber xwendevanên xwe. Orjînal pirtûkê bi tirkî hatiye nivîsandin. Lê di nav pirtûkê de wergera wê ya bi kurdî jî hatiye kirin. Ez bawer im ji ber ku Înstîtuya Kurdî ev pirtûk weşandiye, pêwîstiya wê bi wergera kurdî jî ditiye. Lê li ser berga pirtûkê tenê navê wê yê bi tirkî hatiye nivîsandin, Mirovê kurd ê ku li Başûr an jî li Ewrûpa dijî gava wê pirtûkê di pirtûkfiros de bibîne jî ku dizane di hundirê pirtûkê de wergere wê ya kurdî jî heye.

Nivîskarê pirtûkê H.Mem li ser gelek taybetiyên Xanî sekiniye. Bi rastî ev cara yekemîn e ku felsefaya Xanî bi awayekî zelal hatiye şirovekirin. Felsefa Xanî bêguman felsefeyeke materyalist e. Bingeha felsefeya wî ji dijberiyên tiştan pêk tê. Wexta tezekê davêje holê teza li dijî wê jî saz dike. Di wê dema ku herkes xwedî felsefa metafîzîkê ye, Xanî mîna Marks, bi bîr û baweriyekê

mezin dîtin û ramanên xwe bi zîman dîke. Ji bo baş famkirin û qebûlkirina tezan dijberên tezan pêwîst dibîne. Di evîna Mem û Zîn de jî Beko xwedî roleke wisa ye.

Îmge di pirtûkê de zêdetir hatiye bikaranîn. Mem herdem gelê kurd e. Serkeftina Mem serkeftina gelê kurd e, têkçûna Mem jî...Beko di şexsiyetên kesên feodal û kevneperest de hatiye dîtin û xetera herî mezin jî Bekoyên îroyîn tê dîtin. H.Mem herdem Mûsa û Xanî dide ber hev. Her çiqas Xanî fîlozof û oldarekî Îslamî be jî Mûsa ji xwe re wekî rêber dibîne.

Di pirtûkê de ji bo vê yekê du sedeman nîşan dide. Yek jê, hebûna Elohooyan yekîtiya gelê İbraniyan



dereng dixîne. Xanî mîr, beg û axayan dişibîne Elohooyan û dibeje ji bo yekîti û wekheviya gelê kurdan divê ev kesayeti ji holê rabin. A duymîn jî neteweperwerbûna Mûsa ye.

Xanî gelê kurd gelekî nexweş û nezan dibîne di wê demê de. Sedema wê nexweşiyê;

kesên ku bi her awayî û her dek û dolaban dixwazin Mem û Zînê ji hev veqetînin û wan ji hev dûr bixin dibîne. Ji bo nexweşiya gelê kurd baş binasiya diviya ku pîvana zanîstiyê baş bi kar bîniya.

Xanî, Mem û Zîn mîna reçetekê dibîne û ceribandina reçetê diyarî gelê xwe dîke.

Nivîskar di cihekî de dibêje: "ferdîbûn (bireysellik) nexweşiya gelê kurd a herî mezin e." Ez bawer im dixweze bibêje ezpe-restî, yekperestî (bireycilik) nexweşiya gelê kurd e. Ji ber ku hem di felsefeya Xanî, hem jî felsefeya materyalizmê de ev baş diyar e ku kesê ferdîbûna xwe nexwe destê xwe nikare civakek nû bifirîne û ji ber vê yekê jî nikare azad bibe.

Bi kurtasî ev pirtûk ji dema persan -ku ji bo di dîrokê de yekem car wî gelî kurd kuştine ji hêla nivîskar gelê "parsek" tê bikaranîn- heta dema îroyîn rewşa kurdan bi awayekî zelal derdixe ber xwendevanan. Îmge û felsefeya Xanî encax ewqas zelal û hêsan dikare bê zimên. Bi rastî gava mirov wergera wê ya kurdî jî dixwîne mîna orjînalê wê kêfxweşiyekê dide mirov.

ŞÊXMÛS SEFER

## Giya di bin keviran de namîne

HASAN KAYA



Bav û kalên me xweş gotine, "giya di bin keviran de namîne". Giya mutleqa riyekê ji xwe re dibîne û ji bin kevir derdikeve. Ev gotin prensîbêke diyalektîkê bi awayekî din vedibêje. Di wateya "tu caran made wînda nabe" de ye. Enerjî jî beş bi beş in. Bi awayekî din, em dikarin bibêjin madeyek berbiçav jî dibe, ew made dikare bihele û dikare bibe gaz û ji ber çavan jî wînda bibe, lê nayê wê wateyê ku madeya ku ji ber çavan wînda bibe, tune dibe.

Nêzîkî heştê sal e ku dewleta tirk dek û dolab, ji Moxol, Oğuz, Bîzans û Osmanîyan weke mîras girtine. Konetiya hemû noker û xulamên ku ji nav kurd û gelên din derketine jî tevî wê mîrasê kirine. Wan dek û dolabên xwe li ser serê hemû gelên cînar honandine. Bêhtir jî listikên wan bûne para kurdan. Lê çawa ku me li jor qanûna siruştê da ber çavan, gengaz nîne ku kirinên dewleta tirk eşkere nebin. Topal Osmanê ku mîrkuj û celadê M.Kemal bû nikaribû qirêjiyên xwe bide veşartin. Mustafa Muğlalîyê ku 40

mêrên kurd ji bo ku ji bakurê welêt derbasî rojhilatê welêt bûbûn, dabûn ber guleyan û laşê wan seridandibû, xirimandibû. Bi tenê mirovek ji wan, birîndar ji mirinê filitî bû. Navê wê bûyerê, di dîrokê de wekî "Sih û sê gule" tê nasîn. Kirinên Nurettîn Paşayê celadê Koçgiriye û yên hemû celadên din yek bi yek ji qul û qewêran derketin. Di dîroka dewleta tirk de, gelek bûyerên wiha hene. Em nikarin yek bi yek wan bibêjin. Lê em dikarin hinekî dabaşa van çeteyên dawîn bikin.

Piştî ku tevgera azadiyê ya gelê kurd xurt bû û êdî hevpeyvîn bi Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê re hatin çêkirin, wî di wan hevpeyvînan de her dem qala du klîkan, qala du bendên şerê taybet dikir. Gelek wext kete navê, sal bihurîn. Îro em lê dinêrin ku ew her du bend êdî ji aliyê hemû çavan ve tene dîtin. Lewra wê demê encax çavên dûrbîn dikaribûn bibînin. Lê îro çavên qels jî dikarin bibînin.

Kî ne, ev çete? Bendek jê xwediyê paseporta sor e, ya din xwediyê ya kesk e. Bendek xwediyê îtîrafkar û cendermeyan e, benda din xwediyê Turkeşçî û cerdewanan e. Bendek jê xwediyê sofik ango Hîzbîqontra ye, benda din xwediyê serokeşîrê kurdan e. Van çeteyan benqe li hev par kirine. Bajar û herêm li hev par kirine, sazîyên îstîxbaratê, terîqet, televizyon, rojname li hev par kirine. Holdîng, weqf û zanko li hev par kirine. Mirovên ku dê bêne

kuştin li hev par kirine. Em bibêjin bendek ji ya çeteyan gundî, karker û jinên welatparêz ên kurd bikuje, benda din şoreşgerên tirk û karbidestên kurd qetil dike. Şiklê kuştinê jî di nav xwe de beş kirine. Hinek bi keleşê, hinek bi kêr û satorê, hinek bi demançê kuştinê dikin. Hinek bi gulebarankirinê karê xwe dikin, hinek bi yek berikê. Bendek jê mirovan wînda dike, ya din avayiyên sazîyên pêşverû û welatparêz bombe dike. Em dikarin bibêjin ku van seranserê welatekî di nav xwe de parve kiriye. Tenê tiştê ku wan nekiriye du beş, gotinên ku ew girseyan pê dixapînin, pût, senem, slogan û merşên nijadperest in. Bi tenê al, ol û şovenîzm perdeya li ber çavên her du bendan e.

Çima çete eşkere dibin, tene girtin, tene darizandin, lê ceza naxwin û tene berdan? Bersiva vê pirsê ev e, "ji ber ku hemû sûcdar in, tu kesê ku şahidiyê bike tune ye." Dizî, teşqe, xapandin, mîrkuştin hemû kirinên hovane li ber çavên împaratoriya çeteyan çêbûne. Hemû endamên vê împaratoriye gunehkar in. Gunehkar nikarin hevdû derdest bikin, hev û dû bidin mehkemê, nikarin hev û dû ceza bikin, nikarin cezayê ku were dayin înfaz bikin, nikarin sûcê hev derxin holê. Encax edaleta gelê mazlûm dikare van çeteyên gunehkar bi topiskekê ji hev bipelişîne. Ji bo ku agirê çeteyan were vemirandin, dive ku gel dojeha xwe vexe û wan tê de bişewitîne. Wiha dixuyê ku ew roj nêzik e.

# Jina Mele û Mele

**L**Li navçeyêke Kurdistanê mele-yekek hebû. Ew mele bi weazên xwe bi nav û deng bû. Bi girani jî der heqê jin û keçan de weaz didan. Li mizgeftê di hefteyekê de sê-çar caran digot: "Nehêlin jinên we serqot û çîprût bigerin. Agir ji rûyê porvekirî, çîprûtan dibare, di ola me de ev gunehêkî pir mezin û bêêfû ye."

Rojek ji meha adarê pênc-şêş heb oldar ku her gav dihatin mizgeftê û li weazên mele guhdar dikirin, bûbûn mêvanê mele. Şîva xwe xwarin, destmêja xwe girtin û nimêjê xwe kirin. Piştî nimêjê yekî ji wan got: "Mele ji kerema xwe re ji me re hinek weazan bide."

Mele dest bi weazan kir. Pêşî di nav mijan de çû û hat, hat li ser mijara jin û keçên serqot sekinî. Mele çavên xwe girtin û dest bi axaftinê kir. Got û hey got: "Jina serqot, çîprût agir jê dibare. Jixwe keça lêv bi rûj, neynûk bi oje, ji xwe ew bi xwe agir in." Di vê navberê de deriyê ode vedibe û jina mele sênî di dest de, li ser sênîyê îskanên tije çay dikeve hundir. Lê bi çî awayî. Porvekirî, lê etekêkî kin, neynûk ji ojeya pembeyî (helesor) xuya dikin, lê lêv, lêv jî bi rûjkiyê û sor dikin.



Dema çavên mêvanên mele bi jina wî dikevin, devê wan ji hev diçe û ji devê yekî av diherike heta ser erdê. Yek xwe negire û dipirse: "Mele tu ji me re dibêjî, xweş dibêjî, lê ev çî halê jina te ye?" Mele lê vedigerîne û dibêje: "Ma, bêbavê pir lê tê."

## Kevroşk û Qula nîr

Rojekê axa tevî mazûvanên xwe di-

çîn nêçîrê. Di nêçîrê de kevroşkekî digirin û tînin malê.

Mazûvan dibêjin:

- Axa em vê kevroşkê çî bikin?
- Wê berdî hewşê.
- Axa, lê belê deriyê hewşê vekiriye.
- Tu tişt pê nayê, wî nîrê ga têxin dêrî.

Mazûvan wekî axa dikin. Dem dibihure, dinêrin kevroşk tune ye. Li vir û li wir digerin kevroşkê nabînin. Diçin vê

yekê ji axê re dibêjin. Axa dibêje: "Ba gî aqilmendan bikin. Ka kevroşk çar reviyaye." Bang dikin, aqildar tîn, nekî lê dikolin û dibêjin: "Wele A hebe, tunebe di qulika nîr re reviyaye."

BAVÊ EG

## Tekera trêne teqiyabû

Gava kurd nû dest bi derxistina rojnameyê dikin, xebatkarên rojnameyê hê baş bi rêxistinî nayên rojnameyê. Gerîndeyê rojnameyê rojekê dinêre çerçî rojin xebatkarekî rojnameyê dereng kar. Roja dinê di civînê de gerîndeyê xebatkar dipirse: "Heval çima tu çerçî roj in dereng dimîni?"

Xebatkar bersiv dide: "Wele ez rojêkê hatim ber trêne lêgerîna polîsan hebû li nasnameyan mêze dikirin. Bêbavê em gelekî dane sekinandin. Roja dinê e gihîştim ber trêne wê rojê jî sefera trêne dabûn sekinandinê ji ber wê ez dereng mam. Û îro jî ez hatim piştî em siwar trêne bûn di nava rê de tekerê trêne teqiyaye. Heta çêkirin û em hatin ez dereng mam."

BERHEVKAR: CEMAL ÇEMAL

## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (134)

## XAÇEPIRSA

Levê Şerabê (Wêne)	A	girtala çavên xwe	N	Navê Nîrê (Jina)	A	leza	O	Melê	T	Di berhemê de çar r...
A	Y	S	E	Z	M	A	L	K	A	Ç
Fingirêk	A	T	Cemal Nîrê (Jina)	T	U	R	Wê berdî hewşê	X	X	A
Serxolê (Wêne)	H	E	Z	R	A	S	T	R	R	
Di Xwarinê	A	R	I	N	M	I	K	I		
Yax	E	L	N	A	S	T	O	N		
Nîrê (Wêne)	I	M	S	I	E					
Çerçî (Wêne)	A	K	A	D	R	O	M			
Di ewarê	A	S	A	Y	I	R				
Di Ingilîz	A	R	T	A	N	G	O			

Rêç	Xwedayekî qenci	Bi sorani "em"	Rojek	Tîpa dawin	Me ...
Serokê Vietnamê (Wêne)	Bi kirdkî tepsî	"em"	Tiştê ku bê av najî (berepaşki)	Cumle	erd
4					
Roja berî duh		Cinavkek		....Yunke	
Gihaneke		Paşgîrek		Paşgîrek	
k	Hacetekî cotkîrinê		Ard Helbesvan ekî kurd		
	Jinbav	3		8	
Manzere					
Sewalek			Dengdêrê n Kato		Sembola oksijenê
					9
	Tîpa pêşin	Vexwarina sereke Amin(Xîris tiyankî)		Çadir Xwedê giravî	
	Çerçî				
Megrî					
Wext			2	Xwarina sereke	
		....Gazî (pireka Gazî Mihemed)			
Yetkî					
Hafiza			5	Cihê genim herandinê	
		6	Kurtêlxwar		

**Bersiva Xaçepirsa 131'ê**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 135'an pirtûka Înstîtuya Kurdî 'Çirokên Gelêrî' ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku pirtûka F. Dilgeş 'Kurdistan' qezex kirine ev in: Mahfuz Kondu / Êlih, Mehmet Babayîgît/Agirî, Medenî Alpkeya/ Amed, Sîrac El/ Mêrdîn, A.Vahap Yilmaz/ Semsûr

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9

# Vardayinê Azadiya Welatî sero amey lanetkerdin

Vardayinê ke roja 19'ê aşma gelawêjê nêzdiya saet 11'î de Nûnergeha Azadiya Welatê Mêrsînî nê viraziya, bi sebebê reaksiyonê

girdî. Saziyên neteweyî no verdayinî ser nê eşkerakerdinî viraştî û no vardayinê nê mardimî protesto kerd. Zey nimûne persbenoyê kovara Avaşîn û Kovara

Özgürleşen Yurtsever Gençlik, Federasyona Kurd a Holanda bi raya mesajê xo, Înstîtuya Kurdî ya Stenbol, NÇM û Ûlkede Gündem jî bi raya telefon piştgenoya xo motra (nişan da) û nê vardayinî protesto kerdî.

Roja 20 gelawêjî keberê (beyra) Nûnergeha Azadiya Welat a Mêrsînî ver de jû eşkerakerdin viraziya. Saziyên zey HADEP, EMEP, Liman-İş, Özgür Halk, Ûlkede Gündem, NÇM, Atılım eşkerakerdin de tewr bi û nêzdiyê sey wendoxên Azadiya Welatî jî wija de hedre bi. Xebatkarane çapemeniya herêmî jî piştgenoya xo nişan da. Vengûvazanê çalakî, edi rojnameyê Emek û Ûlkede Gündemî de ca girot. Eşkerakerdin hetê Nûnerê Azadiya Welatî Fatih Yarancı ya amey wendin.

Eşkerakerdin de vaniya ke vardayinê winayinî nêşênê verniyê xurtbiyayinê Azadiya Welatî bigirê. Bahdo jî hêzên dewlet ra waziya ke kerdoxê nê vardayinî bêrê girotin.


Eşkerakerdin bi sloganên zey "Vardayinê faşistî nêşênê vengê ma bibimê!", "Çeteyî do hesabî bidê şariya!" qediya. Mesajê kovara Avaşîn û Înstîtuya

Kurdî ê Stockholm de jî vajiyawo ke averşiyayinê Azadiya Welat, hêzên limîn hêrs kenê. Coka ê vardayinê wina (ana) kenê hedre. Peniyê mesajî de vardayin yêna lanetkerdin û embazê Ekrem rê raverdin waziyena.

Kovara Özgürleşen Yurtsever Gençlik di mesaja xo de vardayin protesto kerd û wina vato: "Roja ke rojnamegeriya kurdî destpêkerd heta nika, rojname û rojnamegeranê kurd benê nişangehê vardayinê dagirkeran. Vardayinê peyin ke Nûnertiya Azadiya Welatî rê viraziyawo, riyê dismenî dano şinasnayin. Ma zey xebatkarane Özgürleşen Yurtsever Gençlikî nê vardayinê liminî protesto kem/kenê û xebatê şima de serkewtin wazem/wazenê."

Federasyona Kurd a Holanda jî vardayin ebi tewrêdo tûj protesto kerd û wina vat: "Ma heme welatparêzanê Holanda nê vardayinê liminî bi ziwaneêdo tûj şermezar kemi û heme xebatkarên Azadiya Welatî rê û ebi taybetî embazanê şaxê Mêrsînê û embaz Ekrem Hazar rê ravêrdin wazem."

MIYANDÊ VENGÛVAZAN



Sazî û dewrûberanê demokratîk seba protestokerdina vardayinê faşistî keberê nûnergeha ma a Mêrsîn ver de jû eşkerakerdin viraştî.


## Dengê A. Welat û Ü.Gündemê

Berî vêga bi du hefteyan polîsan avêtin ser Hela Bayrampaşayê. Gelek kes digel belavkarê me Bekir Sevgin û karkerên helê ji aliyê polîsên sivil ve hatin binçavkirin. Li gorî ragihandinan kesên ku li halê kar dikin bi giştî kurd in û rojnameya Ü.Gündem û Azadiya Welat dixwînin. Ji ber wê yekê jî, ji aliyê polîsan ve gelek caran hatine tehdîtkirin. Li ser vê yekê roja 21'ê gelawêjê karker û esnafên halê gihîştin hev û di bin serokatiya HADEP'ê de daxuyaniyeke çapemeniyê dan. Di demeke kurt de zêdetirî 600 kesî gihîşt hev û pêşî daxuyaniyek hate xwendin. Li gorî daxuyaniyê, Müslüm Kılıç jî ber ku rojnameyê belav dike sê caran hatiye binçavkirin. Cara dawîn roja 20'ê meha gelawêjê bi awayekî hovane li ber Girtîgeha Bayrampaşayê xistine binçav. Dema ku ew xistine binçav jî destên wî kelepçe kirine û ew bi erdê ve xijiqandine. Li ser vê yekê gel reaksiyon nişan daye, lê vê carê jî polîsan berê xwe daye gel û ge-

lek kes jî gel xistine binçav. Piştî daxuyaniya çapemeniyê beşdaran li helê rojname gerandin û digel sloganên protestoyî rojname belav kirin. Tevî mudaxeleya polîsan jî çalakiyê hetanî dawî dom kir. Piştî ku gel belav bû, polîsan nêzîkî 15 kesî xistin binçav. Yek jî wan jî rêveberê HADEP'a Esenlerê Cemal Kavak bû.

Her wekî çawa li Kurdistanê zarokan rojnameya Özgür Gündemê bi dengê bilind û berz li kolanên Amedê belav dikirin. Li Stenbolê jî li Hela Bayrampaşayê di dema protestokirinê de belavkar bi dengê berz di kêlaka polîsan re derbas dibûn û digotin: "Rojnameya Azadiya Welat bi kurdî derdikeve. Ji rojnameyê nemînin. Gerîla lêdixe A.Welat dinivîsîne. Ü. Gündem engellene mez. Haber hakkımız engellene mez." Vê çalakiyê nişan da ku gelê kurd li metropolan li hemberî zilmê serî natewîne.

A. WELAT/ STENBOL



Karker, esnaf û belavkarên rojnameyê kirinên keyfî yê polîsan, li Hela Bayrampaşayê protesto kirin.

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
SAMI TAN  
■ Berpîrsê Karên Nivîsarên  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
■ Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım  
■ NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
■ Diyarbakır

Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mêrsîn

Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir

Tel: 0 (232) 425 37 02

München:

(Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:

Ihsan Kurt

Tel-fax: 41 21 652 76 07

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

31 104 85 55 43

■ Suriye:

Jana Seyda

Helim Yüsi

Înstîtuya Kurdî panela "Dîroka Berxwedanê ya Kurdan pêk an

# Sînorên çêkirî di mêjiyê kurdan de rûxiyane

Roja 22'ê gelewêjê li Navenda Çanda Alternatîfê (AKM) ji aliyê Înstîtuya Kurdî ve bi navê "Dîroka berxwedanê ya kurdan" panelê hate lidarxistin. Panela ku Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, ji Ûlkede Gündemê Zülküf Kışanak û Lêkolîner û Dîrokan İsmail Göldaş wekî panelîst beşdar bûn, ji aliyê Mamoosta Mustafa Avcı ve hate birêvebirin.


Di panelê de axîfgeran dîroka nêzik a berxwedanên kurdan ku bi giştî di vê sedsala dawîn de rû dane, dahûrandin. Bi kurtasî li ser xalên wekî taybetiyên bîrdozî û ramyarî yên tevgeran, egera bîngêhîna a têkçûna wan, şeweyê birêxistinbûna wan, taybetiyên rêberên wan, cudahiya di navbera tevgerên klasîk û ya nûjen de rawestiyân.

Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan di destpêka axaftina xwe ya ku bi kurdî kir de bal kişand ser xweseriya kurdan a ku di kêma gelan de tê dîtin. Li gorî wî dîroka gelê kurd wekî dîroka xiyane û berxwedanê tê helsen-gandin. Xiyane û berxwedan wekî hevalcêwî digel hev dimeşin. Ev her du tîgînên ku wekî reş û spî ji hev cuda ne û di serhildanên berê de rengê gewr digirin. "Dubendî û aloziyên civaka kurd xwe bi awayekî resen di nav serhildanan de didin der. Hin kesên ku wekî berxwedêr tînan nasîn piştê xiyaneke derdikevin pêşberî mirov. Bo nimûne, Yezdan Şêr jî pêşî xiyaneke li Bedirxan Beg dike, lê piştê li dijî dagirkeran serî hildide.

Sami Tan di domahîka axaftina xwe de wiha got: "Piştî berxwedana Dêrsimê êdî tîkoşîn bi hewldanên çend ronakbîran bi sînora dibe. Lê, dewletê rê li ber wan jî digire. Ev rewşa navborî pir hindik hetanî tevgera azadiyê didome."

Li gorî nîrxandina Tan di navbera serhildanên klasîk û Têvgera Azadiyê de di warê bîrdozî û şeweyê rêxistinî de cudahiyan şênber û kûr hene. Sami Tan bi vî rengî dawî li axaftina xwe anî: "Sînorên çêkirî yên ku mêtîngeriya li welatê me lêkirine di dil û mêjiyê gelê kurd de rûxiyane. Her wiha tîkoşîn êdî di sînorên neteweyî hilnayê, bûye tîkoşîneke navneteweyî. Kurd êdî ji asta berxwedanê derbasî asta serkeftinê bûne."

Ji Ûlkede Gündemê lêkolîner Zülküf Kışanak di destpêka axaftina xwe



Di panelê de Lêkolîner İsmail Göldaş, Perwerdekar Mustafa Avcı, Rojnameger Sami Tan û Lêkolîner Zülküf Kışanak beşdar bûn

de diyar kir ku dîroka berxwedana kurdan a nêzik, di sê qonaxan re derbas bûye. Ji Şerê Cihanê yê Yekemîn hetanî berxwedana Dêrsimê, ya duyemîn ji 1940'î hetanî sala 1975'an tîkoşîna Barzanî, beşa sêyemîn ji 1978'an hetanî roja îro. Di Şerê Cihanê yê Yekemîn de kurdan ligel tirkên di tevaya eniyên de şer kirin. Bi hilweşîna Osmanîyan dewletên nû derdikevin pêş. Ligel van rûdanan kurd diya li cem Komara Tirk cih digirin. Lê piştî 1918'an kurd haydar dibin ku bi dek û dolaban re rû bi rû ne. Li ser vî yekê serî hildidin. Di vî pêvajoyê de kesên wekî Şêx Seîd, Elî Şêr, Seyid Riza, İhsan Nuri û hwd derdikevin pêş. Her wiha Kışanak diyar kir ku di navbera serokên serhildanên wê demê û dewletê de hevdiyan pêk hatine. Lê dewletê bi listikan ew kes girtine û dawî li serhildanan hatiye.

Zülküf Kışanak di peyivîna xwe de bal kişand ser babetê balkêş û girîng. Li gorî wî di dema serhildana Agirî de leşkerên kurd ên di bin serkeşîya İhsan Nuri de cilên leşkerî yên ku heman reng in li xwe dikin, sirûda neteweyî tê xwendin, ala ku kurdan dinimîne tê vegirtin. Her wiha rojnameyêk tîkoşînê çapkirin. Kışanak li ser pêvajoya serdema duyemîn jî ev gotin: Di 1946'an

de li Rohhilatê Kurdistanê di bin rêberîya Qazî Mihemed de Komara Mehabadê tê damezrandin. Li Başûr jî tevgera Mistefa Barzanî heye. Sovyetîstan pêşî piştewaniya Komarê dike. Lê piştî ku bi Îranê re peymanê neftê şanên (imze) dike û ji herêmê vedikişê, hêzên Îranê Komarê hildiwêşînin. Her wiha Barzanî jî bi hêzeke ku ji 500 kesî pêk tê xwe dispêre Sovyetîstanê. Piştî ku General Qasim li Iraqê bi derbeyê re dibe desthilatdar, Barzanî bi tevî van kesan diya vedigere Iraqê. Lê Iraq piştî Peymana Cezayîrê ku digel dewleteke ereb destnîşan kiribû, êrişî kurdan dike. Kurd îcar jî xwe dispêrin Îranê. Lê Îran jî li ber wan dibe asteng û wan bi şûn ve vedigerîne. Di encama van êrişên tund de ev tevger jî difelişê. Kışanak di dawîya axaftina xwe de bi kurtasî wiha got: "Tevgerên wê demê serdanpê eşîrî û herêmî bûn. Egera bîngêhîna a tîkoşîna wan jî ev e. Lê li Bakur piştî 1978'an tevgera ku xwedî bîrdoziyê nûjen e û bi rengekî din nêzik dibe derdikeve pêş."

Lêkolînerê dîroka İsmail Göldaş bi awayekî cihêreng nêzikî mijarê bû. Göldaş diyar kir ku di vî tîgînê berxwedan û serhildanê bi rengekî zelal jî hev bîne veqetandin. Lewre serhildan

ji nişka ve pêk tînan, lokal in. Lê berxwedanê dema dirêj dixwazin, domdar. Göldaş, ji bo vî jî mînakê serhildana Agirî da.

Göldaş diyar kir ku serokên kurdan ên berê di warê ramyarî, bîrdozî û tîkoşînê de xwedî taybetiyên mezînan û karîmatîk nînin; piraniya wan jî nav artîstên an jî bürokrasiya dewletê tînan. Kesên berê li pêş in. Dema yek ji kesên ku serkeşîya tevgeran dikin ji nav refan direvî tîkoşînê tîk diçe. Bo nimûne, di serhildana Şêx Seîd de Binbaşî Qasim derbasî aliyê dewletê dibe û dawî li serhildanê tê. Lê hetanî niha bi sedan kes jî navê xwe bi tevgera azadiyê revîne û tîkoşînê rawestî didome. Göldaş bi bîr xist ku dewlet bo Têvgera Azadiyê dibêje serhildan e. Lê ev yek rast nînin e. Ev 17 sal in ev şer didome, şerê demdirêj domdar e. Kesên ku rêberîya tîkoşînê dikin di dibistanên dewletê de xwendînan ne lê ji nav artîstên û bürokrasiyê nehate ne. Mirovine karîmatîk in. Ev tevgera neteweyî yê tîkoşînê neteweyî yê dewletê jî ev fam kiriyê û cih bi cih devê kesinan li xwe mukir tê.

Panela ku li dora sed kesî tê de beşdar bûn bi pirsên beşdar û nîrxandina dawî ya Mustafa Avcı qediya.

MEMED SERHEDÎ/ STENBOL